

ARMANC
Ji mehê
carekê
dertê
Hejmar: 90
Adar
1989
Buha: 10 Skr.
2.5 DM

Armanc

SERXWEBUN DEMOKRASİ SOSYALİZM

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 90
March
1989
Price: 10 Skr.
2.5 DM



Wahşeta Helepçê bi tundî hat protestokirin

- Qetliama Helepçê, li welat û li derveyî welat bi meş, civîn, mitîng û tevgerên cur be cur hat protestokirin.
- Xwendevanên Üniversita Dicleyê ya Diyarbekir bi civînekê qetliama Helepçê protesto kirin û gotin "Bila 16'ê Adarê bibe roja piştgiriya bi netewê Kurd re".
- Di mitînga Stockholmê de, Wezîrê Derve yê Swêd; Sten Andersson axaftinek kir. Wî di axaftina xwe de got; "Navê Helepçê berî salekê di mîjiyên me de ciyê xwe girt".

Salek berê, di 16'ê Adarê de, dema balafrîn Iraqê, bi çekêñ kîm-yayî Helepçê bombe kirin, 5 hezar Kurd hatin kuştin. Vê rojê, piştî şerî cihanê di tarîxa dînyayê de pelekî nuh vekir. Gelê Kurd tu carî wê vê rojê ji bîr neke. Helepçê, agîrê Newrozê hîn bilindir û mana wê hîn kûrtî kir.

Di meha Adarê de, li welat û li derveyî welat, çi bigre li her derê ku Kurd lê dijîn qetliama Helepçê bi tundî hat protestokirin. Li gelek ciyan pîrozkirina Newrozê û protestokirina qetliama Helepçê bi hev re hatin kirin.

Li welat, di miûnîn SHP'ê de yê ji bo hilbijartina belediyan,

xelk û hin parlamente û namzeten Kurdperwer qetliama Helepçê bi axaftinê xwe û bi sloganan protesto kirin. Li Diyarbekrê, li Batmanê, li Qiziltepe, Bedlîs, Mêrdîn û Nuseybînê û li gelek ciyê din... Li Diyarbekir, di miûn-

ga namzete serokatiya belediya Diyarbekir ê serbixwe de, xanîma Mehî Zana; Leyla Zana û welat-parêzekî din axaftinê xwe bi Kurdî kirin û qetliama Helepçê protesto kirin.

Dûmahîk r.11

Wezîrê Derva yê Swêdê Sten Andersson:
"Navê Helepçê berî salekê
di mîjiyên me de ciyê xwe girt"

Mela Mehmûd Dêrşewî:
"Ez şahidê êrişa roja pêşin bûm"

rûpel: 7

Hilbijartinê herêmî
li Tirkîyê û li Kurdistanê

Partiya Ozal ket dereca sisîyan

- Di hilbijartinê herêmî de, Partiya Ozal (ANAP) %21,71 dengan girt û bes li 2 bajaran reîstiya belediyê bi dest xist.
- SHP li 40, Partiya DYP li 16, RP li 5, MÇP li 3 wilayetan reîstiya belediyê girtin.
- Li Dêrsimê (Tunceli) yekî serbixwe bû reîs. Li Diyarbekir namzedê hêzên Kurd ê muşterek Refîk Karakoç piştî yê SHP'ê bû ê duduyan û 17 300 deng girtin, lê belê li dor 4000 dengen wî hatin şewitandin.

Nûçeya wê di rûpela 3'an de

Li Kurdistanê îsal agirê Newrozê gurr bû

Li Diyarbekrê li Üniversita Dicleyê, li Stenbolê li Üniversita Teknikê û li ya Yıldızê, li Edenê li Üniversita Çukurovayê, li Bûrsayê, li Üniversita Uludagê û li hin üniversiten din Newroz ji alî xwendevanên Kurd ve bi girseyî hat pîrozkirin. Li üniversitan agir hat dadan, govend hat gerandin û sloganê bi Kurdî, "Bijî Newroz, Helepçê, Dêrsim, Qoçgirî, ji bîr naçe tu yek jî" hatin avêtin. Li alî din, di kampê pêşmergeyêñ êsîr de jî agirê Newrozê pêtî veda, Newroz hat pîrozkirin.

Militanên Partiya Pêşeng a Karkerê Kurdistan(PPKK) pûlên Newrozê li diwaran xistin, dilxwazêñ kovara Medya Gunesi jî bi munasebeta Newrozê li Stenbolê şevek çêkirin.

Li Şirnaqê polis bi awakî vekirî li ser Newrozê belavok belavok kir

Nûçeya wê di rûpela 3'an de


Serokê PASOK'ê Azad Mistefa wefat kir

Roja 19'ê Adara 1989'an, serokê PASOK'ê Azad Mistefa, li Stockholmê, li nexweşxana Karolinska(Karolinska Sjukhuset) ji ber nexweşîya xwe ya kanserê (şérpençê) wefat kir.

Azad Mistefa, ji sala 1988'an vir de ji ber nexweşîya xwe ya bêderman, li Stockholmê dima û tedawî dibû.

Azad Mistefa di sala 1948'an de li bajarê Sulêmaniye hat dinê. Wî beşê laborantîyê xwend û dûre di nexweşxana Sulêmaniye de xebîsi. Vê yekê bêtir imkan da wî ku ew bi hêsanî di nav gundiyan de bixebite û alîkariya wan bike.

Azad Mistefa di sala 1960'ı de di nav refîn Partî Demokrati Kurdistan (PDK-I) de dest bi xebata xwe ya siyasi kir.



Dûmahîk r.11

Rojeva Mehe

Lî Tirkîyê û li Kurdistanê Hilbijartinê Herêmî

Di 26'ê Adarê de li Tirkîyê û li Kurdistanâ Bakur hilbijartinê herêmî çêbûn. Herçend ev, hilbijartinê herêmî bûn ji, bi kampanya partiyên burjuwazi, ya hêz û kesen siyasi yên Tirkîyê, rengê xwe guhart, bû dengdana pîvana hêza hukumeta Ozal. Loma ji netica hilbijartinê li Tirkîyê, munâqesek vekiriye li ser çûyin an mayina hukumetê û çêkirina hilbijartinê parlamentoye di demek zûtir de.

Hilbijartin di bin nîrê diktatoriye de çêbûn. Azadî û maflîn mîlet ên esasî tunebûn ku, kampanya û xebata hilbijartinê di warekî demokratik de bimeşê û mîlet bi irada xwe ya azad a temamî, karibe dengê xwe bide. Li Kurdistanê ji vê rewşê pêştir, terorek berfirch jî hat lidarxistin ji bo mîlet çavtîrsandi bibe, nikaribe bi serbesti li gor xweziya dilê xwe, bixebe û dengê xwe bide. Di rewşek wiha de jî, encamên ku ji hilbijartinê derketin, gelek eßkere destnîsan dîkin ku ci li Tirkîyê û ci li Kurdistanê xelk ji rejîma diktatori ya kedkur û xwinxur bêzar bûye, ji hukumeta iro neraziye û dixwaze rojekê zûtir ji bin nîrê wê xelas bibe. Partiya Turgut Ozal a ku berî hilbijartînan mezintîrin parti bû, %21.71 deng girtin û ket dereca sisiyan. SHP (partiya Sosyaldemokrat) bi %28.22 dengan bû partiya yekemin û di dereca duduyan de bi %25.55 den gan DYP tê.

Ji xwe di hilbijartinê parlamentoye de, Turgut Ozal bi 1/3 dengan piraniya parlamentoye xistibû destê xwe û hukumet ava kîribû. Iro tê xwiyakîrin ku ev desteka wî ji nemaye û piraniya parlamentoye li gor pîvanen qanûnen Tirkîyê ji irada mîlet temsîl nake. Loma ji partiyen muxalif, daxwaza wê yekê dîkin ku di zûtîn wext de hilbijartinê parlamentoye çêbibin. Lê Turgut Ozal da xwiyakîrin ku tevî vê encamê ji wê li ser hukum bimîne. Gava hilbijartin neyîn çêkirin wê Ozal karibe, serokkomartîyê ji li gor dilê xwe hilbijêre. Eßkere ye ku di vê meselê de burjuwaziye Tirk ê monopol, berpirsyarîn DYA û yên NATO'yê ji irada mîlet zêdetir guh didin berjewendiyen xwe û li gor berjewendiyen xwe dixwazin idara welet bimeşîn.

Ew vê cesarete, her weha ji rewşa têkoşîna rëxistîni ya mîlet ji digirin. Erê mîlet ji hukumet û rewşa iro ne razîye, lê bi xebata xwe ya rëxistîni, daxwaz û hêza xwe negîhaye wê dereca bilind ku irada xwe li ser wan ferz bike.

Hêzîn şoresser ên gelîri, hin ne di hilbijartin û ne ji di warêne din de, nebûne alternatif ku mîlet baweriya xwe bi wan bîne û xwe bide pişt wan. Muxalefeta çep a burjuwazi (wek SHP) ji ne tu muxalefetek rastin e, xwedî li daxwazen mîlet ên esasî dernayê. Loma ji her ci Partiya Ozal gelek pas de ket ji, SHP tu pêşketinek berbiçav bi dest nextist. Iro hilbijartînek parlamentoye çêbibe, SHP wê nikaribe were ser hukum. A xirabûr partiyen burjuwazi yên baskê rastî li ser hev %60'ı zêdetir deng girtine. Ev dide xwiyakîrin ku piraniya mîlet, ci bi zorê yan dîlxweşîyê û ci ji bi nezanîn an zanînê be di bin tesîra wan de ye.

Li bajaren Kurdistanê ji kêm zêde rewş wiha ye. Hêzîn şoresser û welatparêzen Kurdistanê, Diyarbekir ne tê de li tu bajari namzeden müşterek ji dêrnextistin. Namzedê Diyarbekir, her cendî serokatiya belediye bi dest nextist ji lê di nav "wan gûrên har" de karibû têkeve dereca duduyan. Ev gava ku li Diyarbekir hat a-vêtin ji bo rojîn pêş mesajek gelek hêja dide; bi taybebi di warê têkoşîna müşterek û avakîrîna riya serbix-veyî ya li ser şexsiyeta mîff ya serbixwe de. Divê xeleka vê mesajê ji destneye fititandin.

Gaziya pêşmergeyekî ji kampa Qiziltepê:

"Bi vî hawî dom bike, nagihê havînê emê giş bimirin!"


Pêşmergeyekî ji kampa Qiziltepê li ser rewşa dijwar a kampê nameyek ji kovara MEDYA GUNESI re şand, name di hejmara 7'an a kovarê de hat weşandin. Daxwaza pêşmerge ew e ku nama wî bê weşandin da ku cihan hay li rewşa wan a dijwar be. Li ser vê temiya wî em li vir Kurdiya namê diweşînin.

Dengê xelkê bindest, Ji kovara Medya re!

Berî her tiştî dixwazim viya bibejim; dil dixwest ku em rû bi rû bi hev re rûnîn û derdê xwe ji we re bibejim. Bê guman hûn ji gelşen me haydar in. Şertîn ku em di nav de dijin hûn bi qasî me pê dizanin. Çimkî kovara we car carna di-

derdikeve.

Em bi daxwaza dilê xwe nehatin vir, em ji ber wahşetekê reviyan û me bi zor xwe avêt vir. Wexta em nuh hatin ci hukumeta Tirk be û ci jî bîr û raya giştî ya cihanê be ne bi hawakî têr be ji alikariya me kirin. Wê demê di dest de hin perê me jî hebû. Ya din hewa ji



'Em bi daxwaza dilê xwe nehatin vir, em ji ber wahşetekê reviyan...'

keve destê me, hevalên ku karibin bixwînîn hene. Ji me re dibejin. Em gelek sipasi we dikin ku hûn ji nêz ve bi derdê me dibilin.

Ez pêşmergeyekî Partî Demokratî Kurdistanî Iraq (PDK-I) im. A nuha tevî xêzan (malbat) û xîzmîn xwe di kampa Qiziltepe de dimînim. Sebebê şandina vê nama min ji we re ew e ku roj bi roj rewşa me dijwartir dibe, dikeve haleki ku dilê meriv pê diperite. Her ku diçe ci ixtîmama hukumeta Tirk û ci jî ya mîletê me yê vir be, li ser me kîmtîr dibe, ew hovîtiya ku diktatoriya Saddam li dijî gelê Kurd bi kar anî ji roj bi roj tê jîbirkirin û ji rojeva raya giştî ya cihanê

xweş bû. Me xwe debirand.

Nuha ji tu derê ne ji me re alikariyek tê û ne ji tiştîk di destê me de maye. Li vir, li kampa Qiziltepe bi rastî halê me haleki perişan e. Mîlet bi halê me yê rastîn nîzane. Çimkî rewşa me ya rastîn ne weke ku di hin rojnaman de derdikeve. Mesela, hin rojnamevanen ku têvir, gava li problemen me dipirsin, tevî ku em ji wan re qala problemen xwe yên ku hene dîkin ji, em hew dibînîn ku tiştîn têkiliya wan qet bi me tuneye tê nîvisin. Bi rastî ji em perişan in. Bawer bikin qet nayê bîra min ku bi şev ji serma ez raketime. Li van deran hewa ji pirr sar e, bi sinikek şorba ku didin me

pirsyar dixwazin me berra hev din. Gava em giliyên xwe li ba wan dikin ji me re dibejin ku ma me ban we kiriye, hûn bi daxwaza xwe hatin, loma ji ji we re ci bê dayin divê hûn qîma xwe pê binin.

Daxwaza me ji we ew e ku vê nama em ji we re dişînîn belav bikin. Bîra hemû cihan bîzanibe ku em di ci hali de ne! Ji hukumeta Tirk û bi taybeti ji ji serokwezîr Turgut Ozal re dixwazim vê yekê bibejim: Mala we ava be ku ji ber wahşetâ Seddam we em li welatê xwe hewandin. Lê em ji insan in, hînêkî guh bidin problemen me.

Silav ji we hemuyan re... □

Li Kurdistanê terora dewleta Tirk rawestînin

Di destpêka meha Adarê de li Ingîstan hin hêzên Kurd û Tirk li ser zulm û terora dewleta Tirk, nameyek ji Serokwezîra Ingilistanê Margaret Thatcher û 12 kes û dezgehêna nas ën Ingîstan û navnetewi re rîkirin.

Li Ingîstanê di destpêka meha Adarê de alîgirê Rizgarî, PSKT (Partiya Sosyalist a Kurdistana Tirkîye), PPKK (Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan), TDKP (Partiya Komunist a Şoresger a Tirkîye), TBKP (Partiya Komunist a Yekgirtî ya Tirkîye), Dev-Yol (Riya Şoresger), VP (Partiya Nis-timan a Tirkîye), TKKKO (Rêxistina Rizgariya Tirkîye û Kurdistana Bakur), Karkirê Sosyalist û Komika Jinan a Londrayê bi hev re li ser zulm û zordariya dewleta Tirk nameyek ji hin kes û muese-seyên Ingîstan û navnetewi re şandin. Ji wan hinek ev in; Serokwezîra Ingîstanê M. Thatcher, Serokê Partiya Karkir Neil Kinnock, Serokê Parlamentoaya Ewrûpa, Serokê Konseya Ewrûpa, Amnesty International, Komîsyona Mafêni Mirovatî ya Yekîtiya Netewan, Xaça Sor û h.w.d.

Di namê de qala Korta Qesaba û terora dewletê li Kurdistanê tê kîrin. Û ji wan daxwaz tê kîrin ku hukûmeta Tirkîye protesto bikin û li dijî zulm û terora dewletê dengê xwe bilind bikin.

Dîsa li Ingîstanê alîgirê Partiya Rizgariya Kurdistan, Dev-Yol, PSKT, TBKP, PPKK û Par-

tiya Sosyalist bi belavokekê zulm û terora dewleta Tirk ku li Kurdistanê tê meşandin, protesto kîrin. Di belavokê de zulm û terora dewletê bi çend numûnê dawî, tê diyarkirin:

"Dewlet, ji bo li Kurdistanê nîrê zordestiyê ji dest bernede, mesrefen eskerî her zêde dike. Bi destê waliyê mîtingehkar ku bi selahiyetên firehtirîn hatiye berpirsyarkirin, li Kurdistanê idareyek kîfî tê ajotin. Leşkerên dewleta Tirk li gundê Cizîrê Cinêbir (Yeshîyurt) ku girêdayî Mêrdînê ye, bi zorê pîsiya mirova bi xelkê dan xwarin. Nimûneyek din a politika dewleta Tirk ku li Kurdistanê serdestî û terorê dimeşîne, bûyera Korta Qesaba ye".

Wek tê zanîn li Sêrtê di nav ser-goyekî de, ku gel jêre dibêje "Korta Qesaba" cesetek hatibû dîtin. Li ser vê yekê waliyê kolonî Hayrî Kozaklıoglu di beyana xwe de da diyarkirin ku wan 3 "terorîstên" bê xwedî di wir de veşartine. Lî, gel di wê baweriyê deye ku li herêmê gelek ceset hene. Ji bo vê yekê ji gel daxwaz dike ku ev kort bê vekirin.

Belavok bi zimanê Îngilîzî, Tirkî û Kurdi hate belavkirin.

Hunermendê Kurd

Mihemed Şêxo çû ser heqîya xwe

Di hevpeyvîna xwe ya bi Armancê (Hejmar 64, 1986) re M. Şêxo digot ku "Beroşa ku ez jê nexwim, ez arê wê nakim"

Dengbêjê hêja û bi nav û deng Mihemed Şêxo, di 8'ê Adarê de li bajarê Qamişlo çû ser heqîya xwe. M. Şêxo 41 sali bû.


M. Şêxo di umrê xwe yê kin de ji bo şiyarbûn û rizgarbuna gelê xwe xebatêk mezin kir. Ji bo ku bi huner gelê xwe şiyarbiye û muzîka Kurdi dewle-mend bike wî li Libnanê xwendina muzîkê xelas kir. Li Kurdistanê Iraqê di nava refen pêşmergan de ji bo mafê gelê xwe şer kir. Çend salan li Kurdistanê Iranê ma.

M. Şêxo ji bo pêşdabirina muzîka Kurdi tesîrek mezin li neslînu nuh kir. Wî di vî warî de li Kurdistanâ Sûriyê dersa muzîka Kurdi da xortan, komikên mu-zîkê çedîkir.

M. Şêxo yek ji wan hunermendên Kurd bû ku di sa-len 70'yan de bi stran û muzîka xwe ya Kurdi li hemû perçen Kurdistanê ji bo şiyarbûn û xurtkirina şuûra mili tesîrek mezin li gel kir.

Li gor dîtina M. Şêxo hunermend ew e ku wek pêş-mergeyekî welat, ne bes di xweşiyê de, di hemû hoyen giran de ji divê hunerên xwe di xizmeta têkoşîna rizgariya civakî û netewi de bi kar bîne.

Muzîk û stranê M. Şêxo wê her û her di nava gel de bijîn û gelê Kurd wê tu carî wî ji bîr neke.



Li Kurdistanê îsal agirê Newrozê gurr bû



Îsal Newroz li Kurdistanê Tirkîyeli gelek herêmî û bi aktîfi hat pîrozkirin

Li Kurdistanê Bakur û li hin unîversitên Tirkîyê Newroz îsal li gel her rengê zilm û zorê û hemû şertîn dijwar, ji her sal bêtir fireh û bi girseyî hat pîrozkirin. Li

Diyarbekir li Unîversîta Dîclê, li Stenbolê li Unîversîta Teknikê û li ya Yildîzê, li Edenê li Unîversîta Çukûrovayê, li Bûrsayê Unîversîta Uludagê û hin unîversîten din ji alî xwendevanê Kurd ve forum û civîn çêbûn, li ser Newrozê û rewşa gelê Kurd a iro hat axaftin; di bexçen unîversîtan de agir hat dadan, dîlan hatin kişandin, bandrolên bi Kurdi hatin vekirin û sloganên (şiarên) bi Kurdi, "Biji Newroz, bijî azadî, Helepçe, Dêrsim, Qoçgiri, ji bîr naçe tu yek jî!" hatin avêtin. Li Unîversîta Dîclê zêdîyî 1000 xwendevan agirê Newrozê pêxistin û bi Kurdi şîr xwendin. Li Stenbolê Sultanahmadê ji grûbek ji xwendevan agirê Newrozê pêxistin û dora agir govend gerandin. Polîs ji wan 18 kesan girt. Li gel van teveren xwendevan, pêşmergên ê-sûr ên destê devleta Tirk ji di kampan de agirê Newrozê dadan, ala têkoşîn û liberxwedanê di van kampên êsîran de ji bi hemû hêzîn xwe ve bilind kirin.

Militanê Partiya Pêşang a Karkerî Kurdistan (PPKK) li metropolê û li Kurdistanê pûlén Newrozê li diwaran xistin. Li ser pûlân şîra "Biji Newroz!", "Newroz agirê azadî û serxwebûnê ye!", "Bişkê kolonyalîzm bijî serxwebûn!" dihat nîvîsandin. Dilxwazîn kovara Medya Gunesi di 22'ê Ada-

rê de li Stenbolê ji bo pîrozbahiya Newrozê şevel çekir. Di sevê de zêdî 500 kesî besar bûn û sitra-nen Kurdi hatin gotin.

Polîsê Tirk li ser Newrozê belavokek belav kir

Dewleta Tirk her sal ji bo ku Newrozê nede pîrozkirin wek tê zanîn tedbîren gelek mezin digit. Lî hemû tedbîr û terora wan tu carî gelê me dîdil nekir; Newroz wek cejnec Kurda her sal hat pîrozkirin. Wê ji ber vê gerarda-riya gelê me be ku dewleta Tirk îsal hin rê û takîkên din bi kar anî; tiştekî wisa kir ku di tarixa dewleta Tirk de qet numûneyek wisa tuneye. Li Şîrname, polîs bi hawakî vekirî çayxane bi çayxane gerîya û belavokêni li ser Newrozê belav kir. Di belavokê de wisa tê gotin.

Newroz tê manaya roja nû. Tevgeren di vê maneyê de di serî de li ba Sasaniyan û hin qebileyên Tirk û hin mîleten Musîlman ûn din ev roj wek destpêka buharê qebûl kirine. Sasani ji koka xan-danen Iranê ne. Di dema Osmaniyan de heta wexta Abdulhemîd 21'ê Adarê wek cejna Yorîka (Yorîk, qebileyek ji qewmî Tirk e) ji tê pîrozkirin". (Rojnama Milliyet 23. 3. 1989)

Belavoka polîsê Tirk tiştekî eşkere dike: dijmin dibîne ku bi zulm û zorê nikare rê li pîrozkirina Newrozê bigre; wê çaxê ji li

Partiya Ozal, ket dereca sisiyan

Di 26'ê Adarê de li Tirkîyê û li bajarê Kurdistanê hilbijartinê herêmî çêbûn. Di dengdanê hilbijartinê de Partiya Serokwezîr T. Ozal; ANAP'ê %21.71 deng girtin û bes li du wilayetan reîsiya belediyê bi dest xistin û SHP (partiya sosyaldemokrat) %28.22 deng girtin li 40 bajaran DYP %25.55 deng girtin û li 16 bajaran, RP (partiya dîmî) %9.73 deng û li 5 bajaran, MÇP (partiya faşist) %4.27 deng û li 3 bajaran reîsiya belediyê girtin. Li Dêrsimê kesekî serbixwe bû reîsî belediyê.

Ji van bajaran ên ku li Kurdistanê ne, bi vê hejmarê hatin parvekin: SHP 9, RP 4, DYP 2, ANAP 2 û MÇP 2 bajar. Dêrsim serbixwe.

Ev hilbijartin ji bo partiya Turgut Ozal, bû paşketinek gelek mezin. Partiya yekemîn SHP û ya duduyan ji DYP ye. ANAP ket dereca sisiyan. SHP her ci bû partiya yekemîn ji, ji bo wê ne pêşketinek mezin e.

Piştî vê rewşê, hêz û kesen si-yasî yên Tirkîyê didin xwiyakirin ku piştî vê netîcê, Turgut Ozal

ser Newrozê dest bi dezenformasiyonê û sextekariyê dike. Lî gelek dereng e, gel di wê zanînê de ye.

Li derveyî welat Newroz bi yekîti hat pîrozkirin

Îsal ji li dervayî welat Newroz bi yekîti û qerardarî hat pîrozkirin. Li Swêdê, li Almanya Federal, li Fransa, li Danîmarka, li Norveçê, li İngîstanê, li Yunanîstanê, li Bulgaristanê, li Awîsturalya û li Amarîka bi tevgeren cur be cur Newroz hat pîrozkirin. Qetîfama Helepçe hat rûreskirin.

Li Almanya Federal li bajarê Hamburgê Tevgera Rizgariya Kurdistan, Cepha Kurdistanâ Iraqê û Partiya Demokrat a Kurdistanâ Iran ji bo pîrozbahiya Newrozê di 25'ê Adarê de şevel merkezi çekir. Di sevê de kîtleyek mezin besar bû. Aram Tîgram, Baran, Şivan Perwer bi dengê û tebûrên xwe sev dewlemend kirin.

Li Swêd Federasyona Komelên Kurdistan di 24'ê Adarê de li Stockholmê şevel mezin û dewle-mend amede kir. Di sevê de di ser 4 hazarî kes re besar bûn. Şivan Perwer, Nasir Rezaî, Delal, Merziyê Ferîqî, Seîd Yusif, Nec-medîn Xulamî, Adil Feqî, Cûdî, Ferhad Baban bi dengen xwe şev xemîlandin, Koma Zembîlfroş, Koma Kurdistan, Koma Dilan û Koma Zarakan bi govendên herêmîn Kurdistanê îştirakî şevê kirin û şev dewlemend kirin.

nikare li ser hukum bimîne. Divê rojekê zûtir, helbijartinê parlamentoyê çêbîbin. Lî Turgut Ozal di beyana xwe de da xwiyakirin ku wê dev ji hukumetê bernede.

Li Diyarbekir kes û hêzên we-latparêz ên Kurd namzetekî ser-bixwe yê muşterek derxistibûn. Tevî, propaganda hukumetê ya dijminatî, qedexekirin û zilm û zordariyê ji ev namzed di dengan de ket dereca duduyan û 17 300 deng girtin. Lî belê li dor 4000 dengen wî hatin şewitandin.

RAMANÊN RAMANWERAN

Ferhad Şakelî dilê kê şa dike?

Hesen Mizgîn

Di kovara "Statens Kulturrâd Informerar nr. 7/8 1988" de nivîseke Ferhad Şakelî derçû. Di vê nivîsa xwe de Ferhad Şakelî qala poesya Kurdî dike. Li ser vê yekê bi kurtî be jî di nivîsa wî de agahdariyê hêja hene.

Daxwaz û hêviya me ji nivîskarêne me ne tenê domandina lêkolîna eserên Kurdî, lê pêşkêşkirina wan ji bo gelê me û gelên din e jî. Ji ber vê yekê divê mirov qîmetek baş bide fêkiyên nivîskaran û heyâ ji mirov bê di kar û barê wan de alîkariya wan bike. Di vê babetê de ez wisa bawer im ku Kurdên Swêdê alîkariyek baş didin nivîskarêne Kurd.

Lê Ferhad Şakelî di nivîsa xwe de bi tenê li ser poesya Kurdî râneweste. Ew li pêşberî karbides-tên Swêdî rexne û gazinêne neheq li ser grup, rêxistin û rojnamên Kurdî jî dike. Dema mirov nivîsa wî bi temamî dixwîne dikeve şikê jî, gelo wî nivîsa xwe ji bo agahdariyê nivîsandiye yan jî ji bo qirêtkirina grûp, rêxistin, weşanxane û kovarêne Kurdî nivîsandiye? Bi baweriya min ev nivîs ne ji bo agahdariyê, lê ji bo qirêtkirinê hatiye nivîsandin.

Ne mumkun e ku ez nivîsa F. Şakelî bi temamî pêşkêşî we bikim. Di destpêkê de qala poesya Kurdî û pişt re hinekî qala jiyana xwe, zahmetiyêne ku li derî welêt kişandiye dike. Di dawiya nivîsê de jî bi sê pragarafen kin rexne li ser sistema alîkariya Statens Kulturrâd tîne û êrîş dibe ser grûp, rêxistin û kovarêne Kurdî.

Ezê pêşî Swêdiya wê, pişt re ji Kurdiya nivîsa F. Şakelî pêşkêşî we bikim.

"*Stödet ger i många fall inte till sådan verksamhet som verkligen skulle kunna stärka kurdisk kultur och språk. Istället kommer de grupper, organisationer eller tideringar till del i själva verket strävar efter att begränsa yttrande frihet, frihet och demokrati".*

"*Alîkari bi piranî ne ji bo kar û barênu ku bi rastî dê bikarîbin çand û zimanê Kurdî pêşde bibin, tê dayîn. Grub, rêxistin û kovarênu ku di eslê xwe de li pey bi sînorkirina demokrasiyê, azadî û azadiya fikrîn xwe pêşkêşkirinê ne, alîkariyê distînin".*

"*Jag tror inte att detta är en medveten politik från bidragsgivarnas sida..."*

"*Ez ne bawer im ku yên ku alîkariyê didin, bi siyasetek zanîn vî karî dîkin..."*

Pişt re jî F. Şakelî iddia dike ku Statens Kulturrâd bi alîkariya ku dide grub, rêxistin û kovarêne Kurdî tenê çavê me Kurda boyax dike ne

tîştekî din û carna ev boyax dibe tîrek û dikeve çavêne çanda Kurdî.

Divê pêşî ez ji xwendevanan re kîjan rojname, kovar û çapxaneyen Kurdî ji Statens Kulturrâd alîkari stendine û distînin bibêjim. Ji kovar û rojnaman Armanc, Kulîlk, Roja Nû, Kurdistan Press, Berbang, -kovara Federasyona Komelêne Kurdistan li Swêdê - ji Wezareta Karûbarêne Biyanîyan alîkariyê distîne), ji çapxanan, Çapxana Jîna Nû, Çapxana Çandî ya Kurd, Çapxana Mala Kurd, Çapxana Orfeus, Çapxana Sara, Tara Satterî, Çapxana Deng. Ji bil van çapxanan kesen bi serê xwe kitêban çap dîkin û alîkari ji Statens Kulturrâd distînin hene. Wek Mahmûd Baksî, M. Taha, Fadil Jaf û A. Zangane û M. Uzun. Ev jî dide xuyakirin ku alîkariyek pîrtir ne ji grûbêne Kurd, lê ji kesen

Her kovar, çapxane, enstîtu, akademî, komele, federasyon, hunermend û nivîskarê Kurd ked û xebata xwe, bi sebir û fedekarî didomînin. Fêkiyên van xebatan wek tîreke bi jahr li dilê dijminen Kurda roj bi roj derdi Kevin holê û ji ber vê yekê ji dost û hevalbendên Kurda jî roj bi roj zêde dibin.

Kurd re dike. Xuya ye tercîha alîkariya Statens Kulturrâd, ne li gor şexs an grûba, li gor hêjabûn û derketina kîfîb û kovaran e.

Em vejerin ser nivîsa F. Şakelî. Wek hûn di wergera Kurdî de jî dibînin ku F. Şakelî êrîş dide ser grûb, rêxistin û kovarêne Kurdî û wan bi iddiyêne bê bingeh dixwaze qirê bike. Li vir min divê pişsek ji xwediyê nivîsibikim; Gelo te kengî berê xwe da Federasyonê û rêvebirêne Federasyonê ji te re gotin na? Te kengî nivîseke xwe ji kovar û rojnamen Kurdî re şiyand û nehat çapkîrinê, kê rê li ber fîkrê te girt? Ne hewce ye ku em dirêj bikin. F. Şakelî raste rast iftîra dike. Ji bo ku bala karbdesten Swêdî bikşîne ser xwe, buhtanen li grub, rêxistin û kovarêne Kurdî dike.

Ji aliye din Swêd û avahiyêne Swêdê bi têkoşîna rêxistinî ya kar-kir, cotkar û rewşenbirêne Swêdî hatine afirandin. Swêdiyan carekê baweriya xwe bi têkoşîna bi rêxistinî anîne. Zû bi zû bi buhtanen bê bingeh ên F. Şakelî nayen xapan-din û tişteku ku dikin jî bi zanîn dikin.

F. Şakelî di nivîsa xwe de iddia

dike ku alîkari dike ji wan kesan re ku bi rastî xizmeta çand û zimanê Kurdî nekirine. Bi rastî dema min ev iddia Şakelî xwendez keniyam. Nemaze di van salen dawî de kitêb, kovar û rojnameyên Kurdî ku li Swêdê hatine çapkîrin him ji alî ziman, him ji alî çand û him ji ji alî dîrokî de pêşdeçûyinek berbiçav e. Kesê ku vê yekê nebîne kor e, belengaz e. İcar yê ku "bi rastî" xizmeta çand û zimanê Kurdî dike eger bes Şakelî bi xwe be ew tîştekî din e. Xwiya ye ew ji xebata xwe pêşter qîmete nade ya tu kesi. Lî, ji wî pêşter heta niha kesekî ne-nivîsiye ku Şakelî şairekî mezîn e, di dereca Goran, Şêrko Bêkes, Abdulla Pêşew de ye.

Wisa xuya ye ku ne bi dilê F. Şakelî ye ku grûb, rêxistin û rojnameyên Kurdî ji Statens Kulturrâd alîkariyê bistînin. Bi rastî alîkariya Satens Kulturrâd ne bi dilê dijminen Kurda ye jî. Konsolosxana Tirkîyê tim û tim gazin ji hukûmeta Swêdê dike ji bo ku alîkariya xwe ji Kurda qut bike. Dema dijminen Kurda daxwazek wiha ji hukûmeta Swêdê dike em Kurd pîr guh nadin van gotinan. Lî ku daxwazên wiha ji yekî ku xwe "Mamostayê Kurd" û "Nivîskarê Kurd" dihesibîne bê, divê mirov lê hûr bibe û bi hawakî cîddî lê binihêre. Gelo kesê xwediyê van daxwazan dikare bibe mamosteyê Kurd an jî nivîskarê Kurd?

Her kovar, çapxane, enstîtu, akademî, komele, federasyon, hunermend û nivîskarê Kurd ked û xebata xwe, bi sebir û fedekarî dijminen Kurda roj bi roj derdi Kevin holê û ji ber vê yekê ji dost û hevalbendên Kurda jî roj bi roj zêde dibin. Di demek wiha de vatiniya F. Şakelî piştgiriya têkoşîna gelê Kurd e, ne dilşakirina dijminen gelê Kurd.

Ferhad Şakelî di nivîsa xwe de iddia dike ku tenê grûb, rêxistin û rojnameyên Kurdî ji Statens Kulturrâd alîkariyê distînin. Lî wek min li jorê jî pêşkêş kir, kesen bi serê xwe jî ked û xebata xwe pêşkêşî karbdesten Swêdî dike em doza alîkariyê dike. Pîr caran jî daxwaza alîkariyê tê qebûlkirin.

İro ku alîkari -weke ku F. Şakelî dixwaze - ji Kurdan qut bibe xebat ranaweste û wê dom bike, lê wê qels bibe. Ji xwe ez wisa bawer im ku ji aliyeke de daxwaza F. Şakelî valakirina meydanê ye. Ew dixwaze ku meydan bila vala bibe û tenê jî wî re bimîne. Na xêr, ev yek ne ewqas hêsan e. Şertê hebûna li meydanê, qada têkoşîna gelê Kurd e. Ew kesê ku di vê qada têkoşîne de cîh negire, ciyê wî li meydana Kurda jî tuneye.

Siimyên me

Lawikê Berrîvanî

Qembûrê ser zembûr

Li gor ronakbîren Ewrûpî fetwa Xumeynî ya li ser Selman Rûşdi ne karê aqila bû, ji biryarek wiha re tolerans nîşandan ne mumkûn bû. Her çiqas li gor ronakbîren Ewrûpî fetwa Xumeynî ne karê aqila bû jî lê li gor meleyen Iranê fetwayek di cî de bû. Çimkî li gor dinê İslâmî di orta mirinê û jiyanê de sinor tuneye. Yê kuştî heger ne-heq be ji xwe kuştîn heq kiriye. Na ku bi neheqî hatibe kuştîn, wê caxê jî wê ev neheqî têkeve ber gunehê wî. Ü mumkun e ku bi xêra vê neheqîya lê bûye, here Cinetê. Heger Ruşdi jî kuştîn heq kiriye ji xwe heq kiriye û qetla wî "helal" e. Ü na ku bi neheqî, bê súc bê kuştîn, cardin tîştekî wenda nake, ji ber ku wê têkeve ber gunehê wî. Mesela koçkirina ji Londonê ber bi gorra tarî jî pîr ne muhim e, dawîya dawî ev dinya "derewîn" e, dinya din a "rastî" e.

Esas min dixwest di vê meselê de qala neheqîya ku li Kurda bû bikira lê bi aliki din de cûm. Wek tê zanîn li ser romana Ruşdi di demek kin de li gor gotina, cephâ Xumeynî; cephâ irticayê û cephâ demokrasiyê ava bû. Van herdu cephan di gelek warî de bî rojan êrîş birin ser hev, hevdû birin û anîn, lê kesi kes nakawt nekir; bêtir keçikî ketin. Di vî serê "dîn" û "demokrasiyê" de jî essas cardin ci hat, bi serê Kurdan de hat, dîsa Kurd di bin nigan de pelçiqin. Ne cephâ "irticayê" û ne jî ya "demokrasiyê" negotin Kurd gune ne, dîbê em wan zêde neşinîn.

Cephâ Xumeynî dibêje Ruşdi bi romana xwe li hember Muhammed û din'ê İslâmî heqaret û bêrûmeti kiriye; lema jî qetla wî helal e. Li hember vê, cephâ demokrasiyê jî dibêje, hurmetta me ji her "dîn" re heye, lê nabî ku ev hurmet azadiya fîkrî ji navê rake û hwd. Lî belê di rastiyê de hurmetta her du aliyan jî ji her "dîn" û ji her fîkrê re tuneye. Heger ne wiha bûya wê ji destpêka munaqeşa romana Ruşdi û heta iro ji bawerî û "dîn" û hin Kurdan re bêhurmeti û heqaret nekirana.

Wek em dizanın beşekî ji me Kurdan Ezidî ne û Melekê Tawuz dihebinin. Ne cephâ Muhammed û ne jî ya İsa li hember vê bawerî û vî "dîn" û Kurdan tu hurmet nîşan nedan. Heta ji wan hat bi rojan gotinê nemayıji bawerî Kurdan re kîrin, gotin; "Ayetîn..." nizanim ci û "Ayetîn...". "nizanim ci..." Bêyî ku carekê ji bînîn bala xwe ku bi binavkirina vê romanê li hember bawerî û dînekî din bêhurmetiyê dikin. Nefikirin, ji ber ku hurmet ne ji her dîn'î re, ji dîn'î xurt re heye. Li vê dînyayê yê xurt, hurmetta herkesi jê re heye.

Li ali din Kurdan bi xwe jî li hember vê êrîş û bêhurmetiya li dij wan, ji tirsa negotin kirt... Lî ya hîn xerabtir, wan bi xwe jî di weşanen xwe de qala bûyeren ku bûn kîrin û navê romanê jî nitirandin. Bes di vê nabîn de tişte kîrin, di deng û bahsîn Radyoya Êrivanê de navê romanê kîrin "Şîrîn Cîna".

Çawa ku di bindestiya netewi de li dînyayê numûneyek din wek a Kurdan tuneye, di mesela "dîn" de jî ev yek wisa ye. Bira ev jî qembûrê ser zembûr be...

Agahdarî

Abonetiyen abonên me yên sala 1988'an xelas bûne. Divê hevalen abone heta meha Gulânê abonetiyen xwe ya 1989'an bisinîn.

Ew kesen ku heta meha Gulânê abonetiyen xwe neşinîn emê abonetiyen wan bîbirin.

Redaksiyona Armanc'ê

Civîna Hêzên Kurd û Wezîra Biyaniyan a Swêdê

Li ser daxwaza Wezîra Biyaniyan a Swêdê; Maj Lîs Low roja 14'ê Adarê civînek di navbera rëxistinê Kurd û wezîrê de pêk hat. Ji herçar perçen Kurdistanê rëxistin (heyetek ji Cepha Kurdistanâ Iraqê, heyetek ji Tevgera Rizgariya Kurdistanê û ji Partiya Demokrat a Kurdistanâ Iranê, ji Komela, ji Rizgarî, ji Partiya Pêşverû ya Kurdên Sûriyê û ji Federasyona Komelê Kurdistanê li Swêd nimînendeyek) di civînê de besar bûn. Bi wezîrê re pisporê kar û bar ên penaberiyê ji besar bûbûn.

Civînê 4 seet ajot. Di civînê de Wezîra Biyaniyan û pisporê wê li ser siyaseta hukûmeta Swêd a li ser penaberan rawestiyen û problemen penaberên Swêd anîn zîmîn. Her wiha behsa wê yekê ji hat kirin ku hukûmeta Swêd di rojîn pêş de wê çi tedbirîn qanûnî û idarî li ser van probleman bis-tîne.

Wezîra Biyaniyan li ser rewşa Kurdan ji rawestiyâ û da xwiyakirin ku him di riya Komisyona Netewenê Yekbuyî ya Bilind a Penaberan re û him ji di riya xwe re wê alîkariya penaberên Kurdên Iraqê bikin ku iro li kampên Tirkîyê di rewsek dijwar de dijîn û wê hin kesan ji wan bînin Swêd.

Serokê Federasyona Komelê Kurdistanê li Swêd Keya Îzol ji civînê de li ser rewşa penaber û karkirê Kurd ên li Swêd rawestiyâ û daxwaz kir ku hin prob-lemen wan ên ku hene bênelki-

rin. Di nav daxwazên xwe de K. Îzol her wiha cih da mesela programen bi zimanê Kurdi di radyo û televîzyona Swêd de, mesela zêdekirina alikariyê ji bo xebata kultura Kurdi, zêdekirina daghemen(krêş) zarakan û avakirina Merkeza Kulturî ya Kurd.

Rêxistinê siyasi yên herçar perçen ji bi kurtî piştgiriya daxwazên serokê Federasyonê kirin û zêdetir li ser rewşa welat sekînîn, hêvî kirin ku hukûmeta Swêd alîkariya siyasi bide têkoşina gelê Kurd û mesela Kurd di civînê navnetewi û di ya Nete-wen Yekbûyî de bîne zimên.

Nimînendê TEVGER'ê ji li ser rewşa Kurdistanê rawestiyen, da xwiyakirin ku her çendî nufusa Kurdan li dora 15 milyonan e ji wek millet ji hemû mafan bêpar in. Hebûna Kurdan bi xwe ji nayê qebûkirin. Nimînendê TEVGER'ê her wiha da xwiyakirin ku piştî 12'ê Ilona 1980'yî rewşa Kurdan dijwartir bûye û di van çend salêñ dawî de hin guhertin ji idara eskerî ber bi idara sivil de çedîbin ji rewş li Kurdistanê ber bi çeyiyê ve neçûye. Teví wê ji ji ber têkoşina miletê Kurd, rewşa herêmê û navnetewi iro mesela Kurd li Tirkîyê di rojnaman de, di parlamentoye de tê munâqesê-kerin. Nimînendê TEVGER'ê destnîşan kir ku, di vê munâqesê de, burjuwaziyê Tirk, hin jê, siyaseta kevn a înkarkirina navê Kurd dimeşîn lê hin ji dibêjin ku bi înkarkirina Kurdan mesele hel-

nabe, divê Kurd bêñ qebûkirin û mafê kulturî yê wan bê dayin. Li alî din hêzên siyasi yê Kurd, di têkoşina xwe de bi armanca ser-xwebûna Kurdistanê rabûne. TEVGER'ê ji programek wiha da ye pêşîya xwe.

Nimînendê got ku têkoşina ser-xwebûna Kurdistanê qonaxek dûr û dirêj wê bajo. Di vê navberê de di merheleyek nêzîk de divê ku ji bo bidestxistina daxwaz û mafen acil ê gelê Kurd ji xebat bê kirin.

Nimînendê TEVGER'ê wiha domand: "Hin xusûsiyeten cihê ên Tirkîyê ji yê Iranê, Iraqê û Sûriyê hene ku em bawer dikin di-karin xebata me hêsatir bikin û wê bihêlin ku em di demek nêzîk de hin netîcan bigrin.

Ji wan welatên ku me navê wan da cihêtir Tirkîye 150 sal e ku di hewla riya Roavatiyê de ye, di-xwaze bibe perçekî ji Ewrûpayê. Ew mutefîkekî NATO'yê ye, di-xwaze bibe endamê Civata Ewrûpa. Wek endamekî NY ji wan welatên jorîn bêtir imze avetiye bin peymanen navnetewi. Yek ji wan 35 welatan e ku imze avetiye bin Seneda Nîhâi ya Helsinki. Peymanen li ser jiyana kar û bar, li ser azadî û mafen mirovayî, li dijî işkencan û karûbarêne huquqî imze kiriye. Biryarê civînê Hevkârî û Ewlekariya Ewrûpa qebûl kiriye.

Tevî ku wiha ye, Qanûna Esasî û qanûnen Tirkîyê bi maddeen li dij van dagirtî ne. Loma imkan heye ku di civînê NY yên navne-



Wezîra Biyaniyan Maj-Lis Lööw

tewi yên Parlamentoye Ewrûpa û yên din de meriv zore bide Tirkîyê ku van qanûnen xwe yên li dijî peymanen navnetewi rake.

Peymanen ku Tirkîyê imze kîrine, wê berpirsiyar dike ku gelê Kurd û mafen wî yên demokratik, milî û insanî qebûl bike. Eger Tirkîye qanûnen xwe li gor van peymanen navnetewi buguhere, gelê Kurd wê bigihîje gelek maf û azadiyê girîng."

Nimînendê TEVGER'ê ji hukûmeta Swêd daxwaz kir ku di van

civînê navnetewi û yên Îskandînavî de zore bide Tirkîyê.

Piştî civînê beyanek rojnamevanî li ser civînê hat belavkirin û her du aliyan ji dan xwiyakirin ku ji civînek wiha gelek kîfxweş bûne û hêvî dikin ku civînê wiha di rojîn pêş de ji bêñ pêkanîn.

Hemû rëxistinê Kurd nameyek müşterek ji di riya Wezîra Biyaniyan re pêşkêşî hukûmeta Swêd kirin, ku bîr û bawerî û daxwazên müşterek ên rëxistin û partîyan tê de bi cih bûbûn.

"Komîta Swêdî ji bo Mafen Mirovî yên Kurdan" civîna xwe ya damezirandinê kir

Piştgiriye xurt bi gelê Kurd re

Serokê Komîte Leif Blomberg; "Ez bi serokatiya Komîta Swêdî ji bo Mafen Mirovî yên Kurdan iftîzar dikim, armanca me him li Swêd û him ji li hemû dinê ji bo mafen Kurdan xebat-kerin e".

Wek xwendevanên me dizanin, me di hejmara 87'an a Armancê de gotibû hin parlamente, rojnamevan, hunermend dixebeitin da ku ji bo parastina mafen mirovî yên gelê Kurd komîteyek mirekî ava bikin. Di 14'ê Çileyê Paşîn de 50 Swêdî civiyabûn, komîteyek muwaqet ava kiribûn. Komîte di komcivîna xwe ya di 16'ê Adarê de, hebûna xwe bi awayekî resmî ilan kir. Ji bo îlankirina Komîte, hilbijartina roja 16'ê Adarê gelek balkêş e; rojek ku gelek Kurd pirr hewceyi piştgiriye ye.

Civînê, rapora xebatê tespit kir û hin bîryar stend. Li gor rapora xebatê Komîte wê van xebatan bike;

Derxistina kovareke periyodik di derheq Kurdistan de

Derxistina broşurekê ku Kurdan û Komîte bide naskirin

Derxistina filmên videoye; li ser tarîx, jiyan û çanda Kurdan

Di çapemeniya Swêd de derxistina hin nivîs û munâqeseyen li ser Kurdan

Li ser mijara mafen insanî yên Kurdan hazirkirina konferanseke navnetewi, lêkolina rê û dirban,

Wê têkili bi muesesên Swêdî yên alîkariyê re bêdanîn û bi wan re bê munâqesekirin, ka çewa kârîn alîkariya Kurden penaber ên di kampan de bikin,

Girtina doza Kurd di rojeka parlamentoye Swêdê de

Ji bo ku Swêd, di Komîtyona Mafen Mirovî ya Yekîtiya Netewan de, li ser pirsa Kurdan vatinîyen xwe bi cî bine, çavdêri lê bê kirin.

Düre, Komîte 24 kes ji bo Komîta Karkir hilbijart. Komîta Karkir ji van kesan pêk tê:

Maria Leissner (parlamentera Partiya Gel), Karl Axel Elmquist (serokê Yekîtiya Kîlisîn Azad), Leif Blomberg (Sekreterê Giştî yê Sendika Karkirê Madenê û Serokê Komîtyona li dij Nijadprerestiyê), Anders Wijkman (serokê kevn ê Xaça Sor), Arne Eriksson, Lars Gunnar Eriksson (musteşarê Wezareta Kar) û Maria Munter.

serokê Rêxistina Parastina Zarokan), Gösta Ekman (artist, rejîsor), Margareta Ringström (nivîskar), Olof Tandberg (nivîskar), Thomas von Vegesack (nivîskar, serokê kevn ê Kluba PEN), Eva Hedas (rojnamevan), Margareta Störnstedt (nivîskar), Sture Linnér (diplomat û nivîskar), Carl Henrik Hermansson (îdeolog, serokê kevn ê Komunisten Partiya Çep), Hakan Landelius (Sekreterê Giştî yê kevn ê Rêxistina Parastina Zarokan), Thomas Hammarberg (serokê kevn ê Amnesty International û nuha ji

Ji bo serokatiya Komîte Leif Blomberg, ji bo serokatiya duemîn ji Thommas Hammarberg hatin hilbijartin.

Serokê Komîta Swêdî ji bo Mafen Mirovî yên Kurdan iftîzar dikim. Armanca me him li Swêd û him ji li hemû dinê ji bo mafen Kurdan xebat-kerin e. Çekirina muxalefetek ji bo gelê Kurd û kişandina bala gelê Swêd ser Kurda, armanca me ye..."

Rastkirin

Di hejmara berê de çend çewtiyên girîng bûne, ji ber vê yekê em lêborînê ji xwendevan dixwazin û wan çewtiyan li jêr rast dikin.

1-Di Rojeva Mehê paragraf 4, réza 11'e de "Tarixa însanîyetê nîşan daye" hatiye nivîsandin; rastî wê "nîşan nedaye" be.

2-Rûpel 6, di pêşgotina Hevpeyvînê de "nûçegîhanê" hatiye nivîsin; rastî wê "nûçegîhana" be.

3-Di rûpel 11, di dawiya nivîsa "Li Iraqê Zarok Tê..." de çend cumle ketine; rastî wê wisa be: "Gelekîn van işkencan bi zarokan ji tê kirin. Li ser zarokan bi awakî gelîmperi işkencâ tecawuza cinsî ji tê kirin."

Parlamentere Sosyaldemokrat ê Danîmarka
Poul Qvist Jorgensen:

"Di kampan de netîce felaket e"

Em di vê hejmarê de hevpeyvîna ku me bi parlamentere Partiya Sosyaldemokrat a Danîmarka Paul Qvist Jorgensen re çêkiriye diwesînin. Wek tê zanîn Jorgensen, yek ji wan parlamentan e ku çûbû Kurdistanê.

Armanc: Te bi komîsyonekê re Tirkîye ziyaret kir. Komîyon ji kê pêk hatibû?

Jorgensen: Komîyon girêdayî Wezaratâ Derva ya Swêd bû û ji 5 parlamenten Swêdî pêk hatibû. Ev 5 kes jî her yek nûne-rên partiyak siyasî bûn. Van 5 partîyan di nav xwe de li hev kiribûn ku wê bi parlamenten xwe re têkiliyê deynin. Armanca bi vê yekê, firehkîrina komîte ye. Ev partiyen bira di merhela pêşî de partiyen Civaka Ekonomik a Ewrûpa (CEE) ne. Lê bi nêzîkbû-na tarîxa ziyaretê ve ji mecbûrî hejmara kesen ku wê biçûna Tirkîye bi parlamenten Swêdî û bi min, hat sînorkirin.

Armanc: Armanca ziyareta we ci bû?

Jorgensen: Armanca ziyareta me mesela mafîn însanî li Tirkîye, îşkence û rewşa Kurdên multecî yên Iraqê bû. Lê ez wisa tê digihîjim ku hûn dixwazin li ser rewşa Kurdên Iraqê bi min re bi peyivin. Çaxa em çûn Tirkîye pêşniyarek konkret hebû. Pêşniyarek ev bû: dihat xwestin ku Komela Mafî Însanî ya Tirkîye ji bo xelata mafî însanî ya Ewrûpa bê nişandan. Wê bê nişandan ya na, nikarim tiştekî bibêjim. Lê di vî warî de em ehemiyetek mezin din din xebata vê komelê.

Tirkîye him îmze avetiye binê paymana Koma Miletan û him jî avetiye binê ya Komîsyona Ewrûpa yê. Peymana dawî di 1'ê Sibata 1989'an de ket jiyanê. Lê em dibînin hîn li welêt îşkence dom dike. Em bi xwe jî bi kesen ku piştî 1'ê Sibatê îşkencê dîtine re peyivîn.

Dema em werin ser mesela Kurden Iraqê, rewş ev e: ne Danîmarka û ne jî Swêd îmkana wan tune ye ku alîkariya multecîyan bike. Sebeb jî ev e: hukûmetâ Tirkîye vê problemê wek problema xwe dibîne û ji ber vê yekê jî li diji alîkariya navnetewî derdikeve. Metoda normal ev e: di navbera Koma Miletan û hukûmeta Tirkîye de hevkârî tê çêkirin û li ser vî esasî alîkariî dibe. Em bi nûneren Multecîyan ên Şûba Koma Miletan a Anqerê re peyivîn. Berseva wan ev bû: em hazir in ku alîkariya multecîyan bikin. Lê belê em naxwazin ku vê alîkariyê wek pere teslimî hukûmetâ Tir-


kiyê bikin. Em dixwazin bizanibin ku wê pera ji bo ci bi kar bînîn? Em endamê Komîyonê bi nûneren Koma Miletan re di yek dîtinê de ne. Siyaseta Koma Miletan a alîkariya multecîyan ev e: li ser esasî Koma Miletan û hukûmeta Tirkîye serkêşiyê dixwaze, ku pere ji ci re û çawa bê bi kar anîn ew qerarê bide; dibê, ev karê min e. Ji ber vê rewşê ne Danîmarka, ne Swêd û ne jî Koma Miletan dikare vê daxwazê qebûl bike. A nuha rewş vekîriye, lê kilît di destê hukûmeta Tirkîye de ye.

Armanc: Ew kampan ku te dîtin, rewşa multecîyan çawa bû?

Jorgensen: Bi tevayî di kampan de rewş pirr xerab e. Di demek pirr kin de divê hin mudaxele bên kirin. Yan na, netîce felaket e. Di nav kampan ku min dîtin de ya rewşa wê herfî baş a Mêrdînê bû. Di vê qampê de 15 hezar û 900 kes dimîn. Awantaja kesen vir ew e ku kamp li deştekê ava bûye û dinya germ e.

Di kampa Mêrdînê de gelşa herfî mezin kêmâniyêñ daşirê, himamî û avê ye. Heger van kêmasiyan ji navê ranebin, kamp rû bi ruyê felaketekê ye. Çaxa germî bigihîje 30-40 derecayî bi carekê de wê her babet nexweşî rû bidin. Bi vê çûyinê nagihîje, meha Gulanê wê gelek nexweşî xwe nîşan bidin. Em nexweşî epîdemî, tîfo û ta ye.

Ji bo her sê kampan ku em lê geriyan gelşa muşterek ev e: li gel ku li dora kampan erdê pirr firesh û vala heye, lê cardin jî çadir li ser hev vegirtine. Bi viya armanc ew e ku têkiliya wan û Kurden derve ji hev qut bikin da ku keysê nebînî alîkariya hev bikin. Mesela, li gel ku di kampan de doktor û hemşîreyen Kurd hene lê cardin jî rê li wezifegirtina wan tê girtin. Yen wezifê dikin bes doktor û hemşîreyen Tirk in. Di kampan de mekteb jî tuneye. Erê ew bi xwe jî naxwazin. Ji ber ku wê xwendin bi Tirk be. Daxwaza Kurdan mektebên bi Kurdi ne, kitêbên bi Kurdi ne. Ji kampan ku me ziyaret kir yek jî ya Mûşê bû. Herçiqas ez neçûm jî, lê hevalen min ên çûbûn, şok bûbûn. Çaxa em li wir bûn serma -28 de-rece bû. Binêre ez dikuxum, min li wir serma girt. Heta nuha ardu ji vê qampê re nehatiye dayin.



Parlamentere Danîmarkî Paul Qvist Jorgensen li kampek multecîyan, bi multecîyekî Kurd re

Cara pêşî di van rojan de dest pêkirine ku ji vê kampe re ardu bişînin. Di vê kampe de 25-30 jin, mîr û zarok 24 seetê rojê di odayek 60-70 metre qareyî de derbas dikin. Ji ber ku ji sermî nikarin derkevin der.

Armanc: Li ser gelsên kampe, ma hûn bi berpirsiyaren kampe re peyivîn?

Jorgensen: Erê. Ew kesen ku em bi wan re peyivîn digotin ku hin teşebus hatine kirin. Ew jî ev in: di kampa Mêrdînê de 3 sahayê topê çê kirine. Di nêz de ji vê qampê re wê hin aleten muzîkê bênen temîn kirin. Vana bizzat em ji waliyê Mêrdînê fêr bûn.

Di van kampan de nêzikî 60.000 Kurdên multecî dimîn. Bêyî vê, meqamîn resmî yên Tirkîye ji me re gotin ku li Tirkîye mîlyonek Kurd hene. Berpirsiyaran soz dan me ku derengtir heta 1'ê Gulanê wê gelşen multecîyan hel bikin. Bi vê sozê ne ez û ne jî endamîn komîsyonê yên din bawer dikin. Ji ber ku Tirkîye ne dixwaze zorê bide Iranê û ne jî Iraqê. Gotin ku bi van her du welatan re jî di nav têkiliyê baş de ne. Gelekî iftîxar dikin ku di seranserî herbê de yek gulle jî nefirotine wan. Ez bi xwe di vê bawerîye de me ku Iraqê li hember Kurdan gazên jahrî bi kar anîye.

Gelek caran ji çavkaniyê ji hev azad, giliyê ku vê iddiyê rast dikin, gîhîştin min. Ya din, ew kesen ku li Mêrdînê û li Diyarbekrê em bi wan re peyivîn di vî warî de hemû şikê ji ortê radikin. Mesela, di kampa Mêrdînê de yekî ku

ez pê re peyivîm ji min re got:

- Gundê me bi şev bombe kirin. Ji bo ku hemû riyêne me yê revê bigrin balafirên Iraqê bombe li derî gundê me dîbarand. Bi vî hawî imkana me ya revê ji navê radibû. Di vê êrîşê de, min jîna xwe, ji çar zarokên xwe duduyê wan, bavê xwe û birayê xwe wenda kir. (A nuha 2 zarokên mîrik hene. Mecbûr e ku ew li wan mîze ke. Di vî warî de tu alîkariyekê nagire) Min ji mîrik rewşa dema êrîşê pîrsî. Bersîv ev bû: min verşıya zer kir der û bîna min çikiya. Di dema bombardimanê de bînek wek bîna sîrê û bîna lastîkê tevlihev li her derê belav bûbû. Her wiha tiştîn wisa di kampa Diyarbekir de min ji yekî din jî bihîst. Nûmîneyek din jî ji alî zarokekî ve çêkirina rismekî li ser pelê cixarê bû. Di vî rismî de teknîka êrîşê hatibû çêkirin. Ev rîsim netîca wê yekî bû ku zarok bi xwe dîti-bû, ya jî yekî jê re gotibû. Ev rîsim ji alî zarokekî Kurd ê 8 salî ve hatibû çêkirin. Ez bawer dikim ku ev rîsim berê jî gihiştibû bîr û raya giştî. Bes ev hersê nûmune îspata wê yekî ne ku li dijî Kurdan gazen jahrê hatine bikaranîn.

Li ser helkirina gelşen multecîyan hin xebatên Tirkîye hene. Armanca Tirkîye ji hemû multecîyan ji 1/3'ê wan bişîne Iranê, ji 1/3'ê wan bişîne Ewrûpayê û ji 1/3'ê wan jî ji xwe re bîhêle. Armanca komîsyona me û ya Koma Miletan ev e ku ji dêlî belavkirina wan ve, şertî vegera wan a welatê xwe ji wan re amade bike.

Armanc: Hatina demokrasiyek bi temamî li Tirkîye mesela Kur-

dan jî digre nav xwe. Di vî warî de tu ci difikirî?

Jorgensen: Heta ku li Tirkîye maddeyên 141, 142, 163 hebin meriv nikare qala demokrasiyê bike. Xebata me ev e ku ji bona rakirina van maddeyan em karibin bibin unsûrekî tesirî. Ji ber ku dema Tirkîye dixwaze têkeve nav Civaka Ewrûpayê mecbûr e ku hin guherandinê qanûnên esasî bike. Ji ber vê yekê min beyanek sert da. Min bi vî hawî bang li parlamenten Koma Ekonomik a Ewrûpayê kir; heta ku Tirkîye hin gavan ber bi demokrasiyê navêje bi daxwaza Tirkîye ya endametiya Civaka Ekonomik a Ewrûpayê qet mijûl nebin. Ez vêya iro jî dibêjim û ezê wisa dewam bikim.

Gelek caran min ji berpirsiyaren Tirkîye guhdarî kir, ku wan di sala 1923'an de mesela hindikaiyan(miletan) hel kirine. Berpirsiyaren hukûmetê bi vê yekê xwe serbilind didîtin. Ev, di sala 1923'an de bi bîryarekê dibêjîn hindekayî bes ji kesen ne Musilman ibaret in. Heta ku ev bîryar û ev dîtin bimeşe ne mumkûn e ku ji mesela Kurd re riyek çareser-kinê bê dîtin.

Ya dawî çaxa vejerim ser mese-la multecîyen Kurd; yê rî li ber alîkariya Rojava û Koma Miletan digre Tirkîye ye. Tirkîye naxwaze ku hevkariya tu organîzasyoneke Koma Miletan bike. Dixwaze ew pera bigre û ew tayîn bike. Sebebê vê jî ev e; heger Tirkîye bi Koma Miletan re hevkariyê qebûl bike, di eynî wextê de hebûna Kurdan jî qebûl dike, Ji ber vê yekê xwe nade ber hevkariyê.

□

Wezîrê Derva yê Swêdê Sten Andersson:

"Navê Helepçê berî salekê di mîjîyên me de ciyê xwe girt"

Par van çaxa, di 16'ê Adarê de 5 hezar canêni ciwan û navsalî li Kurdistanê li kolan û meydanêni bajarê Helepçê di navbera 2-3 de-qîqan de hatin kuştin. Salek di ser vê Hiroshima Kurdan re derbas bû. Di vê salê de mesela Kurdan bû aktuel, dostêni Kurdan zêde bûn, ji bo bi destxistina mafê însanî yên Kurdan ji alî dostêni me ve Komîte hatin sazkinin. Yek ji wan Komîtan, Komîta Swêdî ji bo Mafêni Mirovî yên Kurdan e.

Di salvegera qatlîama 16'ê Adarê de li Swêdê vê Komîte mitîngê organîze kir. Di mitîngê de bi navê hukûmeta Swêd Wezîrê Derva yê Swêd Sten Andersson axast.

Serokê Rêxistina Parastina Zarakan Thomas Hammarberg di axaftina vekirina mitîngê de digot

ku "Helepçê bûye nîşana zordes-tiya ku hukûmetê Tirk, Irak, Iran û Sûriyê li gelê Kurd dikan. Em li vir ji bo peyadakirina mu-xalefetek navnetewî, ji bo mafê însanî yên gelê Kurd kom bûne. Qirkirin, hepskirin û bi darê zorê koçkirina gelê Kurd divê li neslén dahatû neqewime."

Wezîrê Derva yê Swêd Sten Andersson bi gotinêni şibandina Helepçê bi bûyerên getoyen Nâzîstan û şerî Vietnamê dest pê kir û got: "Navê Helepçê berî salakê di mîjîyên me de ciyê xwe girt. Em tu caran rismen ji wê derê ji bûr nakin. Ew rismen ku li oden-yen me yên runiştinê ciyê xwe girtin, rismen zarokên wek ku di xewê de bin xuya dikirin, lê di şerê kîmyayî de şehîd ketibûn. Ew rismen ku dişibiyen zarokê ku bi şerê xwe li Getoyen War-

sowayê bi çavên pirsyarî li havîr-dora xwe dînihîrt. Ew rismen ku dişibiyen keçika Vietnamî ku agir pê ketibû û ji bo jiyanê ji napalmê direviya. Di 16'ê Adara 1988'an de bajarê Helepçê li Kur-distanê, di dîrokê de wek gelek bajarêni ku şahidê hovîtiyê ne, hat gazkirin".


Sten Andersson di axaftina xwe de li ser bikaranîna çekêni kîmyayî rawestiya û diyar kir ku bikaranîna çekêni kîmyayî li dij mafê însanî ye û tu car nayê efûkirinê. Ew, li ser zulm û zordesiya ku li gelê Kurd tê kirin sekinî û got: "Jenosida Helepçê carek din şanî me da ku gelê Kurd ne tenê li Iraqê lê li welatên din ku Kurd wek netewekî lê hene, nesil bi nesil, sal bi sal di bin zordestiyê de mane. Ji ber netewebûnê cu-dakrin û teqîbatên siyasi, dînî û bûr û baweriyyê şexsî ku ji alî Netewêni Yekbûyî li dij mafê însanî hatine qebûlîrin, e".

Sten Andersson di axaftina xwe de dûr û dirêj li ser mafê penaberan û wekheviya Kurdan û gelên din rawestiya.

Wezîrê Derva yê Swêd S. Andersson axaftina xwe wiha qedand: "Erîşa li ser Helepçê, mirina kesen bê sûc, wê tim û tim wezifîn me yên têkoşîna li dij zordestî û tadeyê bîne bîra me."

Pişî Axaftina S. Andersson Şairê Kurd ê bi nav û deng Şérko Bêkes bi dengê xwe yê gurr li ser Helepçê şirek xwend. Şüra wî ji alî artîst û rejîsorê bi nav û deng Gosta Ekman bi Swêdî ji hat xwendin.

Di mitîngê de Parlamentera Partiya Gel Maria Leissner ji ax-



Sten Andersson: "Jenosida Helepçê carek din şanî me da ku gelê Kurd ne tenê li Iraqê lê li welatên din ku Kurd wek netewekî lê hene, nesil bi nesil, sal bi sal di bin zordestiyê de mane."

(Foto: Azad Perwer)

Mela Mehmed Dêrsewî*:

Ez şahidê êrîşa roja pêşîn bûm

25'ê heyqa 8'an hukûmet hat. Pêşî ji hemî rexâ ve, ji rexê Zaxo bo Kanîmastyê, ji rexê Dihokê bo Amîdîyê û Dêralokê û Şîfadizê, ji rexê pişta Misul bo menteqa Akrê û Şexan û ji rexê navbeyna Erbil û Musul ra hat. Du feyleq ji 30 heta 40 hezara ye, du feyleq ji bili casha her ji berî ku bêt ji ewel re dest avêl çêke şimyayı. Roja 25/8 ku hatîbin heta Kanîmastyê her wê rojê teyare hatin, herdu rexê çiyayê Metin û rexê Berwariya û rexê Sehneyê û pê da biçit heta xwe li pişta Zaxo bidit, di gel menteqa Dostkiya ve di gel menteqa Bergayê ve, eve hemî di êk rojê da bombarana şimyayı kir.

Li mintîngê çiyayê Metin, li nav Berwariya yê ez pê hesîham Yeknâle, Hêni, Bazî, Kanîbelaxî, Wermili, Wabell, Dîhi, Basî, Dukerî, Bejérka Seyda, Bwîka, heta biçit xwe li çiyayê Lêki bidit, li pişta Zaxo li ser hûdîdê Iraqê û Sûriyê û Tirka, eve hemî di êk seeî de bombaran kir û hewqas li nav Dostkiya û li nav Mizfîriya Bergare û rexê Şexan, yanf pêk ve hemî bombaran kir. Bi rengek tîsa bombarana şimyayı kirin, belgê dara reş bin û hemî hatin xarê. Giya hemî reş bin. Min nedît belê hevala digote me ditun: Teyrik, heywan, rûvî ühwd, miribûn, ketubûn wa dera.

Götina qaymeqamê Zaxo, ewî taxîyi hat bira min ku 16'ê heyva 5 gotibû: em nahêlin, ne insana, ne heywana ne teyra. Min got Welle ewî gotina xwe bi rastî bi cî anî.

Her kesek necar bi ku bi cî awaye heyî piçûk û iyalê xwe ji destê dijmin xelas bikit. Çimkû mexseda wî nehêlana mîletê Kurd bi. Em hatin ser hûdîdê Tirka, vêca çawa eger mirov nav da bit ji mirov nikarit ewî haleti bidî pêş çava ewê hatî pêş. Êk ji wa ser-pêhatiya ku bi çava hatîtiyî ditin ku dema ji Ava Zê derbas dibûn û dijmin hat gibayê û la hatîye ku bab bi hinêk iyalê xwe ve derbas biye û dayik bi hinêk iyalê û ve li wî rexê avê ketiye destê dijmin û 28'ê heyva 8 heta 6'ê heyva 9 eskerê xwe serberdayî kînye li nav wa cihê vegirti weki eskerê Hulagû û Teteriya, weki hemî eskerên micim. Belê Welle kes negîhaye dereca wî Seddamî di cinayet û zilmê da. Li Turkiyê rojnameyekî ji min pîrsiyar kir: Tu, evê datîni dereca kî de? Min got bi Kwedê hêja kes wek evî nehatiye ku em bêjin ev weki wî ye. Eger ew bêjin Hitler, Cengiz û Hulagû hemî wê sagirtû vî bin di zulm û cinayet û de.

(Amane ji héjmar 26 Sîbat, 1989)

* Mela Mehmed Dêrsewî imamî Camîya Mezin a Zaxoyê her wehâ-nivîskareki Kurd eku çapta duduyan a kîteba wî bi tipen Latinî bi navê "Ji Mistaxa Ciya-Jî Gotinê Pêşîya" sala 1989'an de li Swêdî derçû. Di êrîşa par a rejima Seddam de ew ji Kurdistana Iraqê cû Kurdistana Iranê. Ev perçenîvisar ji hevpeyvinak wî hauye girtin ku kovara Amancê pê re kîriye.

dizane, dibe ku sibê ji biqewime. Iraqê tenê çekêni kîmyayî bi kar neaniye. Hin delîl şanî me didin ku Iraq çekêni biyolojîk ji bi kar tîne."

Maria Leissner di axaftina xwe de rexne li Netewêni Yekbûyî ji kir. Wê di vî warî de got ku: "NY, van kîrinê Iraqê ji bo biryara mehkûmkirina Iraqê tê nedît. Herçiqas delîlîn hovîtiya hukûmeta Iraqê ji alî Komsîsyona Ma-fen Însanî ya NY hatîbûn pêş-kêşkirin ji cardin NY biryara

ca me him li Swêdê û him jî li hemû dinê ji bo mafê Kurdan xebatkirin e. Çekirina muxalefetek ji bo gelê Kurd û kişandina bala gelê Swêdê li ser Kurda armanca me ye... 20 milyon Kurd li herêma ku bi navê Kurdistan tê bi navkirin dijin. Kurdistan di navbera Tirkiyê, Iran, Iraq û Sûriyê de hatiye parvekirin. Ji wan ne yek ji mafê însanî yên Kurda qebûl nakin, lê berevajî gelê Kurd li van dewletan tê pelçiqandin, zordestî lê tê kirin, di bin taqîbatê



Bîstek ji mitîngâ Stockholmê (Foto: Azad Perwer)

äftinek kir. Ew di axaftina xwe de li ser kampê multecîyan se-kinî û wiha got: "Par meha Tebaxê gelê Kurd bû qurbana aştiya Iran û Iraqê. Lûleyên çekan berê xwe dan gelê Kurd. Wekî ku heyfa xwe ji gelê Kurd bistînin. Dê, zarok û ixtiyarên bê sûc û bê gu-neh hatin kuştin. Bi êrîşen hukûmeta Iraqê Helepçeyek nuh derekte ortê... Bûyera Helepçê ne tenê par lê berî wê ji qewîmî. Kî

mehkûmkirina Iraqê negirt. Bi rastî ev trajediye e."

Axaftina dawî ya mitîngê Serokê Komîta Swêdî ji bo Mafêni Mirovî yên Kurdan, Leif Blomberg (Serokê Sendîka Karkeren Madenê û Serokê Komîsyona Stoppa Rasîszmê ya Swêdê) kir. Wî di axaftina xwe de bi kurtî wiha got: "Ez bi serokatiya Komîta Swêdî ji bo Mafêni Mirovî yên Kurdan iftixar dikim. Arman-

de ye, işkence lê tê kirin. Raporâ Komîsyona Efûyê şanî me da ku Iraq ne tenê mezinan lê zarakan ji idam dike."

Ne bes e tenê bi mitîng, meş, civîn û platformen din ew sûcê însanîyetê bê ruswa û rûreş kirin, pêwîst e li her cih û her dem Helepçê bê bibiranîn. Pêwîst e 16'ê Adarê bibe roja şehîdîn Kurdan.

Cîrok

Mirin çêtir bû

-2-

Piştî ku ji hev vejetiyan heta ku di tarîtiyê de winda bû Perîxanê le dineri.

Ferhat hulma dawîn li cixarê xist û bêyi ku dûmana wê berde dest bi peyvê kir:

- Hevalno seet tê duwanzda dive em rabin. Paşê destê xwe avêt çentê kêleka xwe û her carê bi qandî sed belavokan jê derêxist û li wan belav kir û bi qasi sed belavokan mayîn ji ji xwe re hişt. Piştî devê çente girt awirêñ xwe li ser wan gerand û domand:

- Wek ku hûn ji dizanin wezifa belavkirina van belavokan li vê taxê li ser me her çaran e. Awayê belavkirin jî wisa ye: Ez û hevalen Cemîl ji jori taxê de û hevalen Eli û Hesen ji ji jeri taxê de dê dest pê bikin û pê de biçin da ku malek ji nemine. Eger di ser sivderên deriyan re ci tune be ku hûn belavokan xwe bavêjin malan; di neqebêñ penceran re, serşok be, metbax be hema ci dibe bila bibe bavêjin hundir... Ger ev ji tunebûn di ser diwarêñ hewşan re..yanı divê tu mal bê belavok neminin. A duduña, pêwîst e em pîr bi tevdîr bin, hûn rewşa Diyarbekir dizanin, dewleta faşist ji gelê me pirtir polis bajêr tije kiriye. Û ji xwe jê pê ve em û qeweta xwe. Lî demançen we..?

Her siyan di mana "herê" de serê xwe hejandin.

- Ë baş e em tev bi hev re dernekevin çêtir e. Bila hevalen Eli û Hesen derên, piştî ku qederek ji mal bi dûr ketin emê ji bi rî kevin.

Eli û Hesen tavilê xwe şidandin, rahiştin çenten xwe û bê ku bipeyiñ di mana xatir xwestinê de serê xwe ji wan re hejandin û hêdika di neqeba deri re winda bûn.

Ferhat ji bo ku heta heval bi dûr kevin xwe mijûl bike rakir belavokekê û disa çav lê gerand. Hevoka seri, paşê a din û a din...Bangî xelkê dikir.

JI GELÊ ME YÊ KEDKAR RE

Ev sê salen gelê me ye di bin nîrê zordariya rejima faşist de derbas dîbin. Roj nabuhure ku keç û lawen me neyên girtin û kuştin. Cendirme û polisên dewletê mina gûrê devbixwin êris dikin ser gelê me û kuştin û talan her berdewam e. Birçiti û xizani edi bûye kabûsek har li ser singa mîletê me....

Îro mîtingehkariya Turk welatê me li me kiriye dojeh. Ma çiyê me ji gelên din kêmîtir e ku ew li welatê xwe aza, em di welatê xwe de êsir in. Ev hemû ji nezanî û bêtifaqiya me tê.

Dîroka têkoşina gelên bindes ispat kiriye ku wexta em ji bo rizgariya welatê xwe, mil bidin hev tu hêz nikare li pêşberî me rawest e.....û didomand.

* * *

Derengiya şevê bû. Esman çıksayı bû. Sirek hênik dileqîya. Stêrka leyлан dida. Carna jê yek ji wan diçerixi tiş li esmana dixist û veđimîri. Ew bajarê ku bi rojê meriv nikaribû ji mirovan nigê xwe baveta, di wê seetê de vingîvala bû. Ji

pîze-pîza dengê tûrtûrkên bekçîyan ku ji dûr ve dihatin û tergereqa bér û melkesen karkeren belediyê ku gemara bajêr paqij dikirin pê ve tu deng tunebû. Carna tirinbelên polisan yên dewriyê bi ajotiniek sist di caden fireh de, dê der û doran kifş bikrana û biçûna.

Ew ji ji malê derketin. Ji bo ku tu sîk neyê ser wan, wek du kesen ku ji şevbérkê védigerin meşyan sere kolana destpêkê, Ferhat hêdika niyuçand hevalê xwe û gotê;

- Belê emê ji vir ve pê de herin. Tu ji wî milî ve ber bi jêr û ez ji ji vi milî ve ber bi jor ve.

Gelek caran karêñ wisa kiribûn lê tu carî weke vê carê ne bi hêrs bûn. Ji ber ku ew jiyanı milete wan tê de bû û ew kuştin û talan ku her roj bi çavêñ xwe diditîn ew li dijî dijmin zedetir dilres kiribûn.

Ma gelo li weliteki ku bûkên ciwan bê mîr bimînin, keçen xama bê destgirtî bimînin, zarokên bê guneh ku haya wan ji çerxa selekê tune ye, bê bav bimînin û qız û jin di orta meydanan de bîn çip tazîkirin û dest bê avêtin namusa wan û bi kurtayî hemû namûs û şerefa wî mileti li ber nigan here dê wezîfa ronakbir û şoreşgeren wî welati ci be? Bi rastî ji divê wisa bûna hemâ li dijî van kirinê hov û krêt ci ji dest bihata diviyabû bihatina kirin. Lew ku xebatek bi kemasî banajî divê bihatina kirin

Carna Ferhat ji xwe re digot: "Eger di rojêñ wilô diwar de ku em nexebeitin û ji bo rizgariya welite xwe tenekeşin gelo di rojêñ were (dahatu) de zaroyen me dê nebêjin; ger pêşiyen me tiştîn baş bikrana niha em ne di vi hali de bûn. Çawa ku em niha loma ji pêşiyen xwe dîkin, dê ew ji ji me bikin."

Bi dilen ji gîre dijmin dagirtî dest avêtin çenten xwe û her yekî ji alikî ve, di neqeba penceran re, di qurukî serşokan re, di ser diwarêñ hewşan re kolane, dudo, sisê.... Balavokan xwe diavêtin û pê da dijün. Ew û Cemîl gelek ji hev bi dûr ketibûn

Di navbera kuçake teng de elektrika malekê hîna ji vêketi bû. Ferhat berê xwest belavokekê bavêje hundur; paşê guhê xwe dêra ku dengê axaftinê tê. Neavêt. Di kêleka pencerê re bala xwe da hundur nêri ku zarokek misêwa digrî û pîrejinek û jîneke ciwan ji bo ku wî aş bikin li ber digerin. Pirejinê ji jînikâ din dipirsî:

- Keça min ma xêr e ev lawik di derengiya vê şevê de digrî, qey der ek wî dişê?

Jînikâ serê lawik danibû ser çokên xwe û xwe bi ser de tewandibû, digot:

- Na welle ez bawer nakim ji ber ku wexta şiyar bû hema digot: bavo, bavo, polisan bavo bir..ma wê kengî bavo were. Te dit wexta bavê wî birin ji ber ku digirîya polisan pehînek li wî ji xistibûn icar qey di xewna xwe de dîtiye loma digrî. Min hinek av ji dayê, tewş e.

Pirejinê bi keser digot:

- Xwedê ji wan re nehèle, Xwedê! Qira mîra anîn, di vi bajarî de xort nehiştin. Ma lawikê minê bitenê ci guneh kiribû ev sosret anîn serê

H. Holî

me. Salek e avêtine binê zîndanê tew bi serde ji panzdeh sal ceza jê re dixwazin. Ma ev karê mîra ye? Dinya bi dewran e, helbet wê rojek hinekên din rabin û pozê van zalima ji bisirkînîn. Neheqî ji tu kesi re namîne. Dengekî stûr û bi kovan derdiket wek dengê mîra bû.

Serhat ji ber pencerê vekişîya û di dilê xwe de got "Herê pîrê wê ji wan re nemîne lê..." Û dîsa dest avêt çentê xwe karê xwe domand.

Ji bo ku belavokan xwe biqedine çend malen dawîn mabûn. Ji nişka ve di fitloneka kuçê da dengek bi hêrs hatê:

- Tu kî yî, xwe tev mede!

Bi wî dengê xezebî re ji nişka ve vecinîqî, pê re dest avêt demançâ xwe, xwe spart diwar û li hêla ku deng jê dihat nêri. Sê mirov bi qandî sî-cil gavî dûrî wî bi qor sekinibû û silehîn dirêj di destê wan de lê xweş kiribûn. Edî şik jê re nema ku polisan dora wî girtibûn. Di wê gavê de fikra revê kir. Ji xwe teslimbûn qet nedibû, lê bi ci awayî bireviya? Ketibû feqa segen har. Pêwîst bû nehatina girtin, bi tenê girtina demançê û belavokan dibû sebep ku panzdeh-bîst salî ceza bixwe. Lî işkence, lê dayina naven hevalen xwe... Lî eşkerekirina xebata nehîni... Na na, nedibû. Mirin çêtir bû ji wî hali. Hîna wî pilana revê dikir ew dengê wek ê hirçê hov disa boriya:

- Ez ji te re dibêjim em te nas dîkin. Tu baş bizanibî ku xelasîya te tune. Her du desten xwe rake ser serê xwe û ji wê tarîtiyê hêdî hêdî ber bi me de were. Eger tu xeletiyek bîcûk bîkî ezê mîjîyê te belav bikim. Zû ke! Bi rastî ji diviyabû zû bikrana. Tarîti jê re bûbû fîrsend. Hemâ xwe da hev û bi baweriya "yan mirin, yan xelasbûn" û bi zûkîrînekk ku meriv şavîn xwe bigre û veke demançê kişand û berê li yê ortê yê ku diboriya girêda û du derb bera singa wî da. Polis, mîna gamêşê ku bi kera serjîkin orîn jê çû û li ser piştî kete erdê. Bi teqînê re her du yên din xwe avêtin erdê û lê reşandin. Piştî ku du derb bera wan ji da tavilê kuçe li xwe bada û baz da.

Teqe teqa silehan bû weke ku xwe bavêjîn agir diteqîyan û gule weke mozén sor li pey wî diçûn; geh li sîvîrnek xaniya diketin, geh li direkîn (darîn) elektrîkî diketin û geh li erdê, li kevirîn şemetok diketin, diçerixîn vîngîn ji wan diçûn. heta taqet di çokan de hebû baz di da da ku ji wê kuçê derbasî kuçake din bibe û xwe ji menzîla gulan xelas bike.

Hîna nêzîkî li dawîya kuçê kiribû ji nişkave kîzîn ji kaboka çoka wî çû û deverû çû erdê, lê hêz da xwe disa rabû û bi kulekî xwe gihand qozuya kuçê. Ji bo ku polis bi ser de neyên du derbêñ din bera valayîa kuçê da û qederek xwe sparte diwar û sekini. Lî çipa wî ya rastê wekî di devê maran de be wisa jan dida. Kaboka çokê hemû xîlxîl bû. Xwîn weke tasek ava germ bi nigê wî da kin, heta pahniya wî diheriki.

Xwestimeşe, lê tewş bû, nigê wî li pey wî nedîçû. Lî mecbûr bû biçuya. Eger pênc deqen din ji dereng

bîma dê ji destê polisan xelas nebuya; ji ber ku hemû weke segen ku bîhna beratê here wan, qewmandinek biçük be ji bi dehan, bîstan dicivin wir.

Destekî xwe da diwar û li ser niğekî meşîya. Bîstikek çû lê nedibû, birin sar dibû û xwînek zêde jê diçû, pêre hêdî hêdî laşê wî sist dibû, dilê wî dixewîr û ber çavên wî tarî dibû. Bi wî awayî dê xwe negîstanta tu derê, dê bîhata girtin. Li wê taxê, malen nêzik yê nas ji tunebûn, ku xwe biavêta malen ne nas ji nedibû. Li dora xwe nêri weke miroveki di orta bahrê de bê hawar bimine wisa bê mefer mabû. Xirabekî kavîl nêzîkî wî bû hemâ xwe avêt xirabe û destmala xwe derêxist, hişk li çoka xwe şidand, di qunceki tarî de xwe dirêj kir û wilô ma.

* * *

Polisan hawîrdorêñ taxê girtibûn. Bi teqîna silehan û çuyin-hatîna polisan re hemû bineciyê taxê şiyar bûbûn û bêyî lemben xwe vêxîn di talda perdan re temâseyî derva dikirin. Ji axaftina polisan ku di navbera xwe de dikirin têgîhiştibûn ku şer çebûye; polisek hattîye kuştin û şoreşgerek bi birindarî reviyaye. Polisan şopa xwîna wî dîmeşandin.

Polisek gazî komsîr kir û gotê:

- Komsîr beg vaye şopa xwînê tê heta devê deriyê xirbe û jê pêve naçe bi tu derê de, xwanê ye terorîst di vir de ye.

Komsîr care-car jê çû û bi ser polisan de qêriya:

- Tavilê dora xirabe bigrin. Heta ji we tê wî nekujin, bi saxî bikeve desten me çêtir e.

Dengê komsîr zingin ji mîjîyê Ferhat anî. Dixwestin wî bi saxî bigrin... Zûka xwe da hev û qerara xwe ya dawîn da "mirin çêtir bû ji wî hali". Tavilê demançâ xwe ya ku di ber qayışa xwe ra kiribû kişand da cêniķa xwe û xwe bi xwe got: Ey doza pîroz, ez xwe di riya te da, ji bo serxwebûna weletê xwe, feda dikim. Lî ez di wê baweriye de me ku, wê roj bê li ser van erden ku xwîna me tête rijandin, govend bêne kişandin û keç û xort, zarok û pîren me wê sitranen azadiyê biqîrin, bi qêrinê wan dê deşt û çiya ji xewa sedsalan şiyar bin û bibêjîn, "Bijî azadî" û wê avên çeman û newalan dev ji herka xwe berdin bibêjîn "Bijî serxwebûn". Wê çaxê her ci ku hestiyen min di axa sar de riziyanin ji, dê giyana min, bi giyanen hemû şehidîn weletê min re weki teyrîn baz, li esmana bi dilşahî temaşeyî govenda azadiyê bikin.

Ü bi kişandina nigê demançê re serê wî bi hêla çepê de tewîya, xwîn ji çenikê bi ser rûye wî de herikî û laşê wî wek erdê ku li ser bû, bê lebat ma.

* * *

Di wê gavê de li malek nêzîk qejînek tûj ji zarokeki çû û pêre hêdî hêdî ji kûr ve dengê nuhurdina pîrekekê hat:

Lori lori lori berxê min lorî
Lori lori lori mîrxasî min lorî

ne karê aqila ye lê rast e

◆ İstasiyona Radyo ya Voice of Amerika niha datayek (kompiterek) nuh li istasiyona xwe bi cih kiriye. Ev dataya dikare dengan wergerine 43 ziman. Sistema vê datayê şirketa Xerox ditiye. Ev data dikare alfaba Latinî, Erebî û Kirili bi cih bike. Ji bo vê datayê problema heri mezin tipen Çini ye. Bi sistemekê rojnamevan tenê telafuza gotineke Çini dînîvisine û data bi xwe ji vi dengê gotina Çinî dînîvisine.

◆ Şirketek Amerikî sistemeke datayê afirandiye û bi vê sistemê şofêr dikarin bi reheti rîya xwe derxin. Şofêr pêsi pê li bişkoka ciyê ku lê ye, dike û pişt re ji pêl bişkoka ciyê ku dixwaze biçe, dike. Data di ekrana xwe de rîberiya şofêr dike û rê şanî wî dide.

◆ Dema mirov li rengê kesk dînihêre, dilê mirov bi rîtmeke rehet lêdixe û dema mirov li rengê sor dînihêre dilê mirov bi rîtmeke dijwar lêdixe. Vê lêkolînê li Fransayê çêkirine. Li gor vê lêkolînê rengê şin ji wek rengê sor tesir li dil dike.

◆ Yekitiya Sovyet sistemeke nuh a transportê afirandiye. Ev sistema transportê ew e ku ji hewayê bi tazyiq di lûleyan re eþya tê birêkirin. Bi vê sistemê di salêkê de 3 milyon ton eşya tê transportkirin.

◆ Yekitiya Sovyet ji Finlandiyâ du noqavên piçük stendin. Ev noqavên piçük, di nav avê de di 6000 mîtro kûrayî de dikarin lêkolînen ilmî bikin.

◆ Li DYB 27 milyon kes nexwende ne (xwendin û nivisandina wan tuneye. Ji 5 kesan yek di xwendina blanketa mehaniya xwe de zehmeti diksine.

Barzanî di dehemîn salvegera koçkirina xwe de hat bibiranîn

Roja 4. 3. 1989'an de li Stockholmê Barzanî di dehemîn salvegera koçkirina xwe de hat bibiranîn. Şeva bibiranînê ji aliye "Komita Amadekirina Dehemîn Salvegera Koçkirina Barzanî" ve hatibû amadekirin. Di şevê de bi dirêjahi qala xebat û têkoşîna Barzanî hat kîrin. Di peyva "Bereyê Kurdistana Iraqê" de li ser rewşa Kurdistana Iraqê hat sekînîn.

Gelek partî û rîexistinê siyasi yên Kurdan û kome-lênen demokratik mesajên sersaxiyê ji bo şevê hinartibûn.

Di şevê de Dr. Cercis Fethullah qala bîranînê xwe û Barzanî kir -Dr. Cercis Fethullah demeke dirêj bi Barzanî re jîyaye-. Li gor gotina wî Barzanî zîmanen Rûsî, Farîsî, Erebî û Kurdi (Kurmanciya jorî û jêri) piir baş dizanibû û ji helbestvanê Faris, Şirazî gelek hez dikir.

Her weha Kerim Husamî ji qala jîyana Barzanî ya li Mahabadê û qehremaniyên wî kir.



Di şeva bîranînê de filmek li ser Helepçe ji hat nîşandan. Şev bi sirûdên nîştimanî û xwendina helbestan dawî hat.

Di kampa miweqet a Qiziltepe de multeciyên Kurd, M. Mustefa Barzanî bi bîr anîn. Li kampê, di roja 1'ê Adarê seet di 08.00 de 13 hezar kes ji bo bîranîna Barzanî rawestîyan.

Pişt re, di hoparlorêن "Çadır kent" (kamp) da stranên Kurdi hate strandin, helbest hatin xwendin. Li ser şexsiyeta siyasi ya M. Mustefa Barzanî û li ser Kurdistana Başûr hate axaftin.

İdareya kampê û hêzên çekdari yêne Tîrk nehiştin di dema bîranînê de rojnamevan û kesen ji der û dorê bikevin nav kampê.

Weşanên Nuh

Şairên klasîk ên Kurd

Ev pirtûk wek ji navê wê ji tê zanîn, şairên klasîk ên Kurd dide naskirin û çend berhemên wan pêşkêş dike. Di pirtûkê de jîyan û van şîrîn klasîkên Kurd hene; Eli Herîri, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî, Melayê Cizîri, Mensûrê Girgaşî, Mîna, Macîn, Sadiq, Bekir Begê Erzî, Pertew, Şêx Nûredînê Berîfkanê û Ahmedê Xanî.

Nivîskarê pirtûkê Abdulreqîb Yûsuf pêşgotinek ji nivîsiye. Ev pirtûk cara yekemîn bi tipen Erebî li Iraqê hatiye çapkirin. Wergera tipen Latînî ji aliye Eli Sêr ve hatiye kîrin. Pirtûk 110 rûpel e û ji aliye Weşanxana Jîna Nû ve hatiye çapkirin.

Navnîşana xwestinê ev e:
Jîna Nû Förlaget
P. Box: 240 12
750 24 Uppsala/Sweden

Mîştaxa Ciya Ji Gotinê Pêşıya

Ev pirtûka hêja ji aliye Mele Mahmûd Dêrşewî ve hatiye hazirkirin li ser pêşgotinên Kurdan e. Di pirtûkê de 867 pêşgotin bi şirovekirin hatiye çapkirin. Pirtûk di sala 1979'an de li Kurdistana Iraqê bi tipen Erebî hatiye Çapkirin, Serbest Zaxoyî ji pirtûk wergerandiye tipen Latînî û îsal li Stockholmê çapkirine. Wergê ji bo pirtûk xweştir bê fêmkirin ferhengokek piçük û li ser jîyana nivîskar ji pêşgotinek li orjinalê zêde kîriye. Pirtûk 275 rûpel e.

Mele Mahmûd bi eslê xwe Şîrnaxî ye, ji mîj ve ji ber zulma kolonyalistên Tîrk koçî Kurdistana Iraqê kîriye.

Navnîşana xwestinê ev e:
Rasheed. M. AB
Bergengatan 12 2tr
164 35 Kista/Sweden

Hindik-Rindik

Muşterî

Kurdeki ji Qonyayê ji qeza Qûliyê ji wek hemweltaiyen xwe, xwe li Swêd girtibû û li ba polis daxwaza ilticayê dikir.

Polis jê pirsi:
- Senetê te çi ye?
- Berber im.
- Ji ber kijan xebata xwe ya siyasi tu mecbûr ma ku welatê xwe terk biki?
- Ez meriveki ne siyasi me û min li welet ji tu xebatek siyasi nekîriye.
- Wê çaxê sebebê hatina te qey abori ye?
- Na, li welet halê min piir xweş bû, debera min baş dibû.
- È heger sebebê hatina te ne siyasi ye û ne abori ye, wê çaxê ji bo çi tu hatiyî li vir doza ilticayê diki?
- Muşteriyen min giş hatin vir, ji mecbûr ez ji li dû wan hatim...

Em dikin bifetisin

Serokwezirê Tîrkiyê Turgut Ozal di gerra xwe ya Rûhayê de Jîna xwe Semra xanim ji bi xwe re biribû. Semra xanim xwest ku hineki li bajêr bigere. Çend polis û çend Rûhayiyen ji partiya Ozal bi dorê ketin û berê xwe dan bajêr.

Piştî bîstek gerr, Semra dageriya dikanek cil û caw (manifatûra). Li jori refê perçak eciband. Şagirtê dikanê çaxa top ji jor danî -qey top giran bû- bê hemdi ba bi ber ket. Semra xanim piir acîz bû, got.

"Ne fedî û ne a'r, çawa tu li ber min vê bêdedbiyê diki?"

Emir da polisan, lawîkê reben girtin, birin mahkemê. Hakim ji şagirt re got:

- Ji bo çi te li ber jîna Serokwezir fis kîriye?
Lawîk bî devoka xwe ya Rûhayê got:
- Hakim efendi, devê me girtine, jîna wi ji dixwaze qûli me bigre.

Èdi em dikin bifetisin, nizanîm emê di kura bîni xwe bigrin û berdin?

Kîjan teres

Pêxwaseki bajari ji pare xwe nêzi mîrikê Bektaşî kir û hetâ hêl û hukum tê hebû şırmaqek(silak) bi tin avêt ji kortika hustu de.

Mîrikê Bektaşî çaxa li pişt xwe zivîri, pêxwas bi tînazi got:

- Tu çi mîze diki, ma her tişt ne bi emrê Xwedê ye?
Bektaşî ji lê vegerand:
- Erê, ez dizanîm her tişt bi emrê Xwedê ye. Bes min meraq kir ku bi destê kîjan teresî da kîrin; ji bo wê mîze dîkim.

Banga Biratî

Kurdino,
destênen xwe dirêjkin hev
bi hev ra bibin yar
Li ser erdê bav û kalan rakin xwînxwaran
bişkenin ling û çêkên dijminen neyar.

Bi hev ra têkevin tekoşînan,
bi hev ra bikin hevkari
Saz bikin Kurdistanek Aza û Serbixwe
nemîne kedxwarî
Welat şen û geş bikin hûn,
êdi li ser gel rabî
ev zulmat û tarî.

Birakî we ê dilşin im, bang we dikim
û usa dibêm, divê usa bi
Hêzên xwe bikin yek,
bi hev ra bibin yek can, hezkiriyen hev,
ku Kurdistan rizgar bi
Silavên biratî ji we hemû
birayê min ên Kurd Kurdperwer ra
NEWROZ'a we pîroz bi.

Riza Çolpan
Awistûralya

Deyîrê Ma

Arêkerdox: Malmisanij

Zewncê çimbelekî

Na deyîri erziyaya 'Ubeydê Qudoy û Axay Qudoy ser. 'Ubeyd û Axa biray yewbînan ê û Pîran ra Key Axay ra yê. Herbê Şêx Se'îdî(1925) ra pey perrayê benê, mehkum benê.

Başçawişê Pîran'î Neşat ta-da mîrdimanê Ubeyd û Axay û giregiranê Pîran'î keno û wazeno ki yê 'Ubeyd û Axay biyârî teslîm bikî. Vatişê tay Pîranjan gorê Bekê Hacî Axay (Bekir Akbaba) û çend tenê bînî rojî xeberi erşawenê 'Ubeyd û Axay dima(Bekê Hacî Axay bi xo mîrdimê 'Ubeyd û Axay o). Na xeberi dim a 'Ubeyd û Axa şonê rojawanê Pîran'î, Meltîn. Hewna vatişê Pîranjan gore,

Rayirê Deredê Xenaqî² hok î-mok î, Kurrda Waran³ ra kewtê zewncê

çimbelekî.

Eno yuzbaşîya bêîman o, Vista zewncâ birayano.

Sefer⁴ biray mi, bê, ma se kî, Ma enê ca ya xwi hesir kî,

Ma veynî ma cay Şêxê Siya'y⁵ ku ra ca kî? Ma qesasê birayanê xwi îcra kî.

Ena Kurra Zengîyan⁶ qay lerzaynî, Axayê birayê mi pa çok daynî. Bêliga cendirman xwi ser tadaynî. Bêliga cendirman xwi ser tadaynî.

Serê Pîran'î⁷ bi keyek î, Binê Pîran'î bi keyek î, Tê ro şonî-yenî Key Hesdê Bek'î,

Xumxumê¹

Xum' Xumê², to rî vana³, Ti nêba ez nêvana. Ti nêba ez nêvana⁴.

Dayikta 'eylan nana, Maya 'eylan ver dana, Çimsiyayan xwi rî ana.

Darê mezlandê ma kewr i⁵, Xumî yenî hewadê hewrî, Çimsiyay î, sênegevrî.

Xumê Gêldê⁶ ma hewt î, Heme hewt kelawçewti i⁷ Pîy cînî manenî mewtî.

1 Na deyîri zey vatişê Nuriyê Gêlijî nusiyaya. Vatişê Nuriyê Gêlijî gore, na deyîri Gêl ra Zikif (Zülküf Karakoç)ⁱ veta.

2 Yew yew ca di herinda "Xum' Xumê" di "Xim' Ximê" vajîyêno.

3 Gêlijî herinda "vana" di vanê "wana".

4 Dormarê Piran'î di tiya ra pey enawa zî vanê:

"...Xim' Ximê, haşa vanî, Keyneka bêtîmânî,

Geyrena dormey banî..."

5 Kewr: Dara ki pîr biya û gil û şaxê yay asan şikiyênê. Kewir.

6 Gêl: Yew nahiyyey Diyarbekir o, Dewleta Türkiye namey yê kerdo Egîl.

7 kelawçewti: Dormarê Gel'i di (mesela Qizlan di) ceni kofiya xwi kiştikanî bestenê. Tlya di cenîyan ra vajiyawo kelawçewti.

Bekê Hacî Axay û embazê xwi he-to bîn ra xeberi danê Neşat Başçawuşⁱ. Neşat Başçawuş û cendirmey şonê, Meltîn di, yew welladi mîyan di na zewncâ birayan tebişenê, benê heta Dî-yarbekir ra û rayîr ra, nuzdî Gêlî di Kurra Waran di yînî kişenê.

Vatişê Nuriyê Gêlijî¹¹ gore, Emîna(ceniya Mehmed Çawuşî), na deyîri eştâ birayanê xwi 'Ubeyd û Axay ser. Vatişan go-re, Emîna Mehmed Çawuşî baltuza Şêx Evdirehîm'î ya. Hukumatê Tirkan, Emîna û mîrdey yay Mehmed Çawuş surgunê Tekirdağ'î kerdî(Tekirdağ: Trakya di yew şaristanê Tirkiya wo).

Zeki deyîri ra zî fahm beno ay wextan hima Şêx 'Evdirehîm (Şêxo Siya) weş bîyo. Zanêno ki Şêx 'Evdirehîm, Herbê Şêx Se'îdî ra pey gelek zeman binê xeti(Sûriya) di maneno, dim a ageyreno Kurdistanê Tirkiya. Labelê eskerê Tirkan nîzdi Bismîlî di, Salat di Şêx 'Evdirehîm û embazanê yê ca ke-nê û ayca di yînî xelî miyan di gan bo ganî veşnenê (gore bo ki Hesen Hişyar nuseno, Şêx 'Evdirehîm û embazê xo Hezîrana 1937'î di kişiyayê). Tay Kirdê dîndarî bawer nêkenê ki Şêx 'Evdirehîm weyra kişi-yawo, vanî "o xelisiyawo, hima weş o".

Esker yeno lek⁸ bi lekî.

Eno Bek⁹ şîy kerdî zûrî, oynî yû dekî, Tebiştiş(Tevîştiş) day zewncê çimbelekî.

1 Mi 1985 di na deyîri zey vatişê Nuriyê Gêlijî nuştibî û kovara(dergiya) Hêvi di neşr kerdibî (b'ownî: Hêvi-kovara çandıya gişî, Paris, no:3, Sebat 1985, r:97-98). Hêvi di soyadîyê Bekê Hacî Axay û Seferî (birayê Emîna) şaş nusiyabi,

2 Derey Xenaqî: Beyntarê dewa Şelbetîn(Kalkan)'î û Gêl(Egil)'î di yew dere wo.

3 Kurra Waran: Beyntarê dewa Şelbetîn'î û Gêl'î di yew kurr(kir) a.

4 Sefer(Sefer Korkutan): Biray 'Ubeyd û A'xa'y o.

5 Şêxo Siya: Şêx 'Evdirehîm(biray Şêx Se'îdî).

6 Kurra Zengîyan: Beyntarê dewa Şelbetîn'î û Gêl'î di yew kurr a.

7 Pîran: Yew qezay Diyarbekir o, Dewleta Türkiye namey yê kerdo Dicle.

8 lek: des hinzarî (10 000)

9 Bek: Bekê Hacî Axay (Bekir Akbaba).

Xeco Keyna M'

Na deyîri di, mari(may) û keyna (Xeco) ver a cê qalî kenî.

(Maya Xeco'y):

-Xec' Xeco, Xeco, Xeco!
Xeco, keyna m', ano meke!
Xeco, keyna m', bê bala marda xwi bide,
B'ownî Huso Dirah wano² çîyo!
Wano: "EZ biz û mîşnanê xwi weye kena,
Xeco'yê Mehmud'î³ rî veynena."

(Xeco)

- Serê kêde ma tehran⁴ o,
Binê kêde ma tehran o.
Cor di yeno qaymeqam o,
Eno torinê Kê Began o.

Serê kêde ma ro yo,
Binê kêde ma ro yo.
Cor di yeno Eybê Xaloyo,
Heway meşka doy o.
EZ nîgêna Eybê Xaloyo!
EZ nîgêna Eybê Xaloyo!

1 Na deyîri zey vatişê Nuriyê Gêlijî nusiyaya.

(Gêl: yew nahiyyey Diyarbekir o).

2 wano: vano

3 Mehmud : Gêl(Egil) ra Mehmudê Roqî(Mahmut Fidan).

4 tehran: zinar

Zirav

Leyro, leyro, Ziravê; day delilê Ziravê!
Ti Ziravay Adon a; leyro, leyro, Ziravê!
Ti quesmetê 'ezeban a; dayê, leyro, Ziravê!
Zirav şona qırçıkî; dayê, leyro, Ziravê!
Zirav şona izimî; day delilê, bêbavê!
Çend resney dey rî lazim î; leyro, leyro, Ziravê!

Leyro, leyro, Ziravê; day delilê Ziravê!
'Elidînê Hesenî espar o; leyro, leyro, Ziravê!
Wayirê mayînda çar o; leyro, leyro, Ziravê!
Hewşê 'Elidînî müşmiş î; leyro, leyro, Ziravê!
Mîratî ta'l û tîrş î; leyro, leyro, Ziravê!
Nekê 'Elidînî birîşî; leyro, leyro, Ziravê*!

* Na deyîri, 1975 di zey vatişê yew dewijê dewa Dêrey nusiyaya (Dêrey: yew dewa qezay Pîran'î ya).

Husnayê

Wî day, wî day, wî dayê; wî dayê, wî dayê!*
Wî day, wî day, wî dayê; day dayê, Husnayê!

Husnay m' aw ver a şûna, wî dayê, wî dayê!
Husnay m' aw ver a şûna, day dayê, Husnayê!

Ti dest-rîy xwi şuwena, wî dayê, wî dayê!
Ti dest-rîy xwi şuwena, day dayê, Husnayê!

Îşligê zûmay z' nexşnena, wî dayê, wî dayê!
Îşligê zûmay z' nexşnena, day dayê, Husnayê!

Ez ha şûna 'eskero, wî dayê, wî dayê!
Ez ha şûna 'eskero, day dayê, Husnayê!

Kom ku Husnay mi beno, wî dayê, wî dayê!
Kom ku Husnay mi beno, day dayê, Husnayê!

Destê ma xençer ser o, wî dayê, wî dayê!
Destê ma xençer ser o, day dayê, Husnayê!

Wî day, wî day, wî dayê; wî dayê, wî dayê!
Wî day, wî day, wî dayê; day dayê, Husnayê!

* Miraco Kêlkesiyîj na deyîri yew kaset (band) di vano (Kêlkesi: yew dewa qezay Ma'deni ya û Dewleta Tirkan nameyê na dewi bedelnawo, kerdo Altıoluk). Mi na deyîri zey vatişê Mirac'î nuşti.

TU NÊZANENA

Axxx ax...
Waxt waxtê Aliyê Gaxî viyênenê.
Waxtê Seyid Riza'y viyênenê.
Vengê kemanê Silê Sûri biyamênê
Ma niya bêkes, bêzar nêmendênê.

Tu nêzanena
Derê Laşî, Çemê Munzuri,
Bowa goni, lesê meyiton.
To nêdiyo ceng,
Bowa baruti.
To o waxt ez bidiyênenê.
Hortê ceng de
To apê xo bidiyênenê.
Genic vine, qewetin vine, çér vine.
Sima zerzele nêdiyo
Leyê Cengê Dersim de
Zerzelê Erzingani çiva wo ke!
Dar-ber ra, owe de, wele de
Gona domanon, kokimori, gencon, veyyikon...
Gon bîye ve laşeri,
Dar-ber fişt ra xo ver, berdi.

Usxan

Şeva Medya Güneşi

Wek xwendevanen me jê haydar in, me di hejmara Armancê ya 87'an de nivisandibû ku Şeva Medya Güneşi di 11'ê Sibatê de wê bibe, lê ji ber hin problemen tekniki şev di wê tarixê de nebü. **Şeva Medya Güneşi** wê di 22'ê Nisan de li Kolnê bibe. Di programa şevê de, Şivan, Şirin, Seid Yusuf, Baran, Temelli, Ali Asker, H. Erdem, Diyâr, Rehber, govend, dia, şîr heye.


Kursa sinemakarı

Komela sinemavanen Kurd di 5'ê Adarê de li bajarê Stockholmê li Medborgarhuset dest bi qurseke sinemavaniyê kirine. Di vê qurşê de derheqê sinemayê de ji alî teorik û pratik ve malûmatan didin.

Ev qurs ji alî Kasim Aziz, Mehdi Umêd, Şuayib Adlig û hin huner-mendên din ve tê dayin. Qurs, heftê du roj (Şemî û Yekşem) e û ewê 3 mehan dewam bike, ji her kesi re vekiriye.

Xaçepirs

Amadekar: S. Rêving



Çeferast: 1-a) Cejna neteweyî ya Kurdan ku her sal di 21'ê Adarê de têt pirozkin, b) Diyari, hediye. 2-a) Ne, nexêr (berevajî), b) Ji dengê ga û çelekan re tê gotin, c) Navê heywanekî. 3-a) Li hinek deveran ji "koxik"ê mirîşkan re dibêjin, b) Navê çemekî, rûbarekî mezin li Kurdistana Iraqê (berevajî), c) Navê hukumdarê Iranî yê zalim û xwînxwar ku Kawayê Hesinger ew kuşt u milleten Iranî rizgar kir. 4-a) Alawê agir (berevajî), b) Bîna pîs û nexweş. 5-a) Gava werîs an çelte an tiştekî din li bin lingê dewaran asê dimîne, mirov destê xwe li lingê dewêr dixe û gotinekê dibêje ji bo ku dewar lingê xwe rake û ew tiş ji bin lingê wî bê rakirin. Ew gotin ci ye? b) Sînonîmek ji bo "kok", "rih", "ra". 6-a) Li demen kevin her eşirekê li deveren çiya cihek nêzî war û zomên xwe hebû, de ma bi eşîrén din re şerek çedibû, li wî cihi dicivian û diçün şer. Carna jî civînen aştîyê yê navbera eşîran de li van cihan çedibû, b) Ar, genimê hatî hêran. 7-a) Ava ku di formê gazê de li esmanan dicive û çaxê rastî bayekî sar bê dibe baran û car-din tê xwarê, b) Qumasê li ber penceran tê hil-

wîstin. 8-a) Daçekek bi Kurmanciya jêrî, b) Ne-xweşiyek (berevajî), c) Ne germî, cemidîn (berevajî). 9-a) Beyraq, 'elam, b) Sînonîmek ji bo "dû-vik", "kuri", "kilk" (berevajî). 10-Erd an zeviya ku saleke nehatiye ajotin, b) Mam, birê bavê meriv, c) Li hinek deveran prona-va girêkî "ku" bi awayekî din tê gotin. 11-Organe-ke laşê meriv. 12-a) Pronava işarkî ji bo tiştîn mî û nêzîk, b) Kesê birîn bibe, mirovê bi birîn.

Serejêr: 1-a) Helbest-vanekî bi nav û deng ê Kurd. Navê wî yê rastî Mele Xidir bû. Sala 1797'an li Kurdistana Iraqê li bajarê Şarezûr li gundê Qeredax hatiye dinê. Li Stenbolê sala 1855'ê mi-riye. Gora wî li "Goristana Uskudar" e. Her bi navê wî bi xwe diwanekî wî ya helbestan çap bûye. Yek ji mezinê helbesta Kur-

Bersîva Hejmara berê

Çeferast: 1- Sebrî Botanî. 2- a)Tû, b)Sîlopî, c)Ra. 3- a)Law, b)Rêgîr. 4- a)Awaz, b)Ta, c)Te. 5- a)Nîsk, b)Nal. 6- a)Lawje, b)Aso. 7- a)Halân, b)Avis. 8- a)Evin, b)Zêwe. 9- a)Wi, b)Ez, c)Vaja. 10- a)Kê, b)Remo, c)Rê. 11- a)Êvar, b)Lê, c)Lî an Di. 12- a)Reşek, b)Baş, c)Se

Serejêr: 1- a)Sûlav, b)Hewlîr. 2- a)Wate, b)Avî, c)Ve. 3- a)Wan, b)Lî, c)Kaş. 4- a)Rî, b)Zîlan, c)Ère. 5- a)Spî, b)Nas. 6- a)Bo, b)Kw, c)Îzol. 7- a)Ol, b)Jan, c)Mêş. 8- a)Tirane, b)Ev. 9- a)Asê, b)Biraza. 10- Gelavêj. 11- a)Tirî, b)Siwar. 12- a)Ar, b)Kose, c)Erê.

Wahşeta Helepçê bi tundi...

Destpêk r. 1

Gel bi tundi sloganan dia-vet: "Em Helepçê ji bîr na-kîn!"

Li Unîversîta Dicle ya Diyarbekir, ya Çukurova, ya Uludag û li gelek unî-versitên Ankarê, İzmîr û Stenbolê xwendevanen Kurd pirozkirina Newrozê û qetîama Helepçê bi hev re pêk anîn. Xwendevanen sloganen: "Bimre Seddamê xwînxwar!", "Helepçê, Dêr-sim, Koçgîrî, ji bîr naçe tu yek jî!" avetin.

Hin welatparêzen Kurd ji bi ilanen ku dabûn rojaman qetîama Helepçê protesto kirin.

Almanyâ Federal

Li gelek bajarên Almanyâ ji bo bîranîna Helepçê mitîng û civîn pêk hatin. Li bajarê Hamburgê ji aliyê Komîta Kurdistan a Ham-burgê -ku ji 16 rîxistinê Kurd pêk tê belavokek û afîsek hat hazirkirin. Komîtê her ji bo vê armancê konferansek û meşek ji amade kir. Di konferansê de Sekreterê Medico International, Avûqat Şerafettin Ka-ya, Dr. Ş. M. Amîn (ji Kurdistana Iraqê ye) axaftin,

Li bajarê Bonnê ji di 15'ê Adarê de civîneke çapemenî hate çekirin. Di vê civînê de wek axeftevan ji Partiya Sosyaldemokraten parlementer Michael Muller, ji Partiyan Keskan Angelika Beer, Ji Medico International û ji Cepha Kurdistana Iraqê Dr. Ş. M. Amîn, besar bûn. Axeftevan qetîama Helepçê wek Hiroshima due-mîn bi nav kirin û her we-ha di vê qetîamê de li ser rola şirketen Almanan se-kinîn. Rojnamen Almanan nûçeya vê civînê dan, Pişti re gelek kes heta ber sefareta Iraqê meşyan û li ber se-farete axaftinek kurt hate kirin. Disa li Bonnê bi mu-nasebeta vê qetîamê pêşan-geheke risman hate raxis-tin.

Her di eynî rojê de li Kol-nê jî gelek kes meşyan û belavokek hate belavkirin. Di bin belavokê de imza HEVKAR, PDK-Iraq, Rizgarî, KOMKAR, Hêviya

Gel, KSSE û hin rîxistinê din heye.

İngîlîstan

Li İngîlîstanê, li dor 600 Kurd ji bo bîranîna Helepçê civîyan û meşyan. Di vê meşê de hin parlementer û kesen navdar ên İngîlîz ji besdar bûn. Ev mes ji aliyê Cepha Kurdistana Iraqê ve hat amadekirin.

Danîmarka

Li Danîmarkayê roja 11'ê Adarê li ser Helepçê konferansek û meşek hat çekirin û belavok hat belavkirin. Ev her sê aktivîte ji ji aliyê Komîta Piştgiriya Kurdistana li Danîmarka -ji 10 rîxistinê Kurd pêk tê- ve hat amadekirin.

Roja 11'ê Adarê de Konferransê de yek ji berpirsyarê Komîtê û Berpirsyarê Cepha Kurdistana Iraqê yê İskandînavyayê Dr. Macît Cafer wek axaftevan besar bûn. Dr. Cafer di axaftina xwe de li ser qetîama Helepçê, rewşa penaberên Kurd li Tirkîyê û li Îranê sekinî, di derheq rewşa Kurdistana Iraqê ya iroyin de agahdarî da.

Roja 16'ê Adarê, nêzî 600 Kurd heta, avayıya Parlementoya Danîmarkayê meşyan. Li ser rewşa Kurdan informasyon dan parlementer Danîmarkayê.

Swêd

Li derveyî welat jî karkir,

Serokê PASOK'ê...

Destpêk r. 1

Di salen 1974-75'an de wek pêşmergeyekî ket nav şerê azadiya gelê xwe. Pişti têkçûna liberxwedana 1975'an di 11'ê ilona 1975'an de wî bi hin hevalen xwe re Partiya Sosyalist a Kurdistana (PASOK) ava kir. Ew di sala 1976'an de ji alî rejîma Iraqê ve hat girtin û cezayê idamî dan wî. Lî dûre ev cezayê wî daxistin 10 sal hefs. Di sala 1979'an de rejîma Iraqê mecbûr ma wî û hin kesen din berde. Di sala 1980'yî de Azad Mistefa ca-

xwendevan û multeciyen siyasi yêndi Kurd bi civîn, meş û mitîngan qetîama Helepçê protesto kirin.

Roja salvegera qetîama Helepçê; 16'ê Adarê "Komîta Swêdiya ya Mafê Mirovî ji bo Kurdan" mitîngek çekir. Xebera vê mitîngê, bi firehî di rûpelên me yê navin de ye.

Tevgera Rizgariya Kurdistana (TEVGER) û Cepha Kurdistana Iraqê bi munasebeta salvegera qetîama Helepçê bi hev re belavokek bi Swêdi belav kirin.

Roja 17'ê Adarê ji bo bîranîna Helepçê Cepha Kurdistana Iraqê ji şevek amadekir.

Norveç

Di 16'ê Adarê de li bajarê Stavengenê ji alî Komela Karkirê Demokrat ên Kurdistana ve civînek hate çekirin. Di civînê de rojnamevanê Norveçî Astor Larsen ku berî hemû rojnamevanen Skandînavî çubû Helepçê, axaftinek kir û di axaftina xwe de got ku ew manzara ku min li Helepçê dît nuha jî carna tê xewna min.

Li Osloyê jî xwendevanen Kurd û Norveçî bi munasebeta salvegera qetîama Helepçê civînek çê kirin û li gelek bajarê Norveçê li ser Helepçê masen infor-masyonê hatin vekirin.

Malmîsanij & Mahmûd Lewendi

Li Kurdistana Bakur û li Tirkîyê

ROJNAMEGERIYA KURDÎ

(1908-1981)

310 rûpel û cildkiri

Adresa xwestinê:

Weşanen Jîna Nû

P. Box 240 12

750 24 Uppsala/Sweden

Mihaïl Gorbaçov:

"Divê em siyaseta xwe ya li ser çandiniyê biguherînin"

Komîta Merkezi ya Partiya Komunîst a Yekitiya Sovyetan, di civîna xwe ya roja 15 û 16'ê Adarê de pirsa çandiniyê munaqeşe kir. Sekreterê Giştî yê PKYS Mihaïl Gorbaçov "Ji bo ku em bikaribin pirs û pirsgirêkên çandiniyê hel bikin, divê em siyaseta xwe ya li ser çandiniyê him ji alî teorî û him jî ji alî pratikê ve ca-rek din berbiçav bikin", got û wiha domand: "Di xwedîtiya erdan de pêkanîna reformê cuda cuda pêdivî ye û pêşdebirina sistemâ iça-rekirê jî gelek girîng e."

Di guhertina siyaseta li ser çandiniyê de ya herî girîng guhertina kolxoz û solxozan e. Daxwaz ew e ku kolxoz û solxoz bibin koo-peratifê icarî. Hemû besen sisteme çandiniyê wê bi serê xwe bin, xwe bi xwe finanse bikin û wê berpirsiyarê encama kar û zirarê bin. Di dahatûyek geleki nêz de wê dewlet alîkariya xwe ji kolxoz û solxozan bibire.

Li gor bîr û baweriya Polît Bu-roya PKYS, ji nuh ve bi rêxistina danûstendina aborî ya çandiniyê, ji bo nûjenkirina siyaseta li ser çandiniyê kevirê bingehîn e.

Mihaïl Gorbaçov di axaftina xwe de li ser tunebûn an jî kêm-bûna hin tişîn xwarinê rawestiya û got:

"Divê dewlet ji derve genim, goş, fêkî, zebze, şekir, rûnê nebatî û hin tişîn din bistîne... Em ji welatên pêşdeçûyi-him ên piçûk him ji yên mezin- ji alî hilberîna kar, kalîte, depokirin û zêdekirina tişîn çandiniyê ve paşde mane. Ferqiyeta me û wan roj bi roj ji zêde dibe".

Li gor istatistikên nuh, hilberîna çandiniyê %20 kêm û ev re-qam di hin tiştan de %30- %40 e. Gorbaçov di axaftina xwe de fer-qiyyeta navbera bajar û gundan jî anî ziman û got;

Tunebûna riyan, li her herêm problem e. Divê mirov ji bo pê-kanîna an jî helkirina hin tişîn pêdivî wek derman, xizmeten bin-gehîn û ji bo stendina hin tişîn ku ji bo jiyana mirov pêdivî ne, bi sedan km dûr biçe. Bi rastî rewşa gundan wisa xirab bûye ku xelkê dest bi koçê kiriye û berê xwe dane bajaran. Vê yekê jî pro-blémek mezin çêkiriye.

Gelo problem ci ye? Tedbîrên ku heya niha bi awakî ciddî li ser



wan dihatin qalkirin çîma nehatin stendin? Çîma guhertinê pêdivî nehatin kirin? Pişti van pirsan Mihaïl Gorbaçov got; "Divê ber-siva problema bingehîn bête da-yîn. Divê em ji kokê de dest pê bikin ku bikaribin rewşa xirab a gundan bibînîn û sebebê tune-bûna hin tişîn xwarinê derxin holê. Divê em ji bo bişâftina van pirsan rê bibînîn".

Mihaïl Gorbaçov di axaftina xwe de rexne anî ser siyaseta afi-randina çandiniya kollektifî û got ku Stalin ne di şopa Lenîn de lê di şopa Troçki û Preobrazenki de çû ku ew bi xwe lî dij siyaseta wan bû".

Mihaïl Gorbaçov bala mirov dik-şîne ser nivîsên Fredrik Engels ên ji sala 1894 ku wiha digot: "Dew-let di destê me de ye. Qet ne hew-ce ye ku em zorê bidin gundiya û malê wan istümlak bikin".

Siyaseta afirandina çandiniya kollektifî zirarek mezin da çandiniyê û di navbera salên 1932-1933'an de di hin navçeyan de bû

sebebê xelayê got, M. Gorbaçov û domand:

"Dema mirov vê perîyodê tîne ber çavê xwe û lê hûr dibe, divê qala trajediya ku bi serê gelê me hat, bike. Di şerê li dij qulakan (feodal) de gelek gundi û gun-diyen xizan zirarek mezin dîtin.. Lî helbet dema mirov behsa şâ-sitiyê ku di salên afirandina çandiniya kollektifî dike, mirov nikare di çandiniyê de înkara pêdiviya guhertinê sosyalistî bike İddiaya ne efektifbûna çandiniya kollektif ji şaş e. Bi ya min potansiyelek gelek mezin di sisteme me ya kollektif de heye û bi dan û sten-dina aboriyek rast mirov dikare bigiliye encameke rast.

Şâsitiya herî mezin li dij sos-yalîzmî, dibêje M. Gorbaçov, de-ma mirov bîr û baweriya Lenîn a li ser afirandina aktif a cemawerî avêt pişt guhîn xwe, hate kîrin. Tu guhertinê civakî, şiarê wan her çiqas rast bin jî, dema gel li dij be û tevî van guhertinan nebe, bi ser nakevin.

Encama hilbijartinê piştgiriya perestroykayê ye

Gelê Sovyetê baweriya xwe bi siyaseta perestroykayê ya PKYS'ê nîşan da. Lî belê hin berpirsiyârên PKYS ên herêmî û yên nav-çeyî di hilbijarinê de raya giştî nestendin û nehatin hilbijartinê.

Li Moskovayê nûnerê PKYS; Yevgenî Brakov li hember Borîs Yeltsîn winda kir. B. Yeltsîn ji dengan % 89, 4 û Y. Brakov ji % 6, 9 stendin. Li Lenîgradê nam-zetê Partiyê Anatolî Gerasîmov li hember mihindisê ınsatê Yuri Boldvrey winda kir.

Li Komara Letonyayê serokkomar, serokwezîr û hin kesen ku serekê partî yên herêmî bûn, ne-hatin hilbijartin. Li Estonyayê se-rokkomar û sekreterê yekemîn ê PKYS dengen giştî (% 90) stendin. Ji Cepha Gel ji du kes (endamê PKYS ne jî) hatin hilbijartin. Sekreteren Yekemîn ên PKYS ên herêmî û navçeyî li Volgogradê, Krasnodarê, Kurskê, Omskê, Sta-vropolê û Çarkovê dengen giştî stendin. Namzetên li Tacikistan û Qazakistanê jî raya giştî stendin.

Gelê Sovyetê eleqeyek mezin nîşanî hilbijartinê dan. "Ev hilbijartin di pêvajoya demokrasiyê de gaveke girîng e" got Gorbaçov û wiha domand: Herciqas tengasiyên me hene, qanûna hilbijartinê bi her alî ne temam e jî lê gelê Sovyetê eleqeyek nedîti şanî hilbijartîne dide. Ev yeka ha pîrî girîng e. Ji ber ku prestroyka tenê li fabrikan, li ınsat an li Üniversitan, li enstituyê Lîkolînê, li dibistan û li nexweşanan bi besdarbûna gelê Sovyetê bi ser dikeve.

Gelê Sovyetê ji bo perestroyka-yê merkez e. Ji ber vê yekê jî divê ew bi xwe bi awakî aktif di pêvajoya demokrasiyê de ciyê xwe bigre. Divê ew xwedî biryar bin.

Encama hilbijartinê, piştgiriya gelê Sovyetê ji bo siyaseta perestroykayê û glasnostê ya PKYS da nîşandan. Lî rastiyek din jî derket holê. Li hin herêm û navçeyan divê PYKS berpirsiyarê partiyê biguherine û ji nuha pê ve jî me-toda xebat û karê xwe nuh bike.

Xelkê Amerîka ji bo kirîna çekan dikevin dorê

kofa Çini, Uziya İsrailê û demançeyen otomatik ên Amerîkî MAC-10 û AR-15 li dikanen silehan tije ne. Di salen 1985 û 1986'an de ji Keleşînkofo Çinê 4000 hatibûn ithalkirin, lê ew reqem di sala 1988'an de bû 40 000 û hemû jî hatine fi-rotin.

İro polisên DYA wek berê bi demançekê û bi copekî naçe kar. Li gor "pêşdeçû-yîna" bi çekbûna xelkê, polis jî çekên xwe zêde di-kin. İro polisek xwedî du demançe, têlsizek, copek û elegê emniyetê ye.

Herçiqas berî her hilbijartin serektiyâ DYA kan-didatên serektiyê soz didin xelkê ku dawîya kuştin û birîndarkirinê û ya çeteyen esrar û eroînê bînîn, lê belê pişti hilbijartinê "sozên xwe ji bîr dikin".

Li gor rojnama Time International, di sala 1985'an de 18.153 kes bi demançe xwe kuştine. Di navbera 1984 û 1985'an de 62 897 kes li DYA bi demançe yan jî bi silehan din hatine kuştin. Li ser vê bi sed hezaran kes birîndar an jî se-qed dimîn. Li gor rojnama New England Journal of Medicine, hejmara kesen ku ji silehan birîndar dibin hewqas zêdeye ku lê-nihîrtina van kesan prob-lemekî mezin derdixe.

Li gor texmîna karbides-tên DYA iro silehan ku li malan hene buhayê wan di-gîhîje navbera 50 û 60 milyon Dolari.

Fîşa abonetiya Armancê

Abonetiya salekê

120 Skr. 120 FF. 20\$ 35 DM

- Salek
- Şes Meh

Tarîx:
Nav û paşnav:
Navnîşan:

Welat:

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgiroya jorê bişîn. Fotokopiya kvîtoya heqê abonetiyê û fîşa jorîn dagirin li ser adresa jérîn ji me re bişîn. Adres: P.Box: 6004, 172 06 Sundbyberg/Sweden